# Piştî 18 salan zarokê xwe hembêz kir

**Endama Koma Aştiyê ya Qendîlê Hamiyet Dînçer ku 18 salan berî niha zarokê xwe yê wê demê 4 mehî bû hiştibû û beşdarî nav refên gerîla bûbû, cara yekemîn kurê xwe hembêz kir**




Hamiyet Dînçer ku zarokê xwe yê 4 mehî 18 sal berî niha hişt û bi hevserê xwe re beşdarî refên PKK'ê bû, li avahiya DTP'ê bi malbata xwe re hate cem hev. Hevdîtina piştî salan bû sedema demên hestewar. Dînçer diyar kir ku ew di demeke cerdevanî û eşîrvanî bûye pergal û riyên siyaseta demokratîk nemayîn derketiye. Hevserê Hamiyet Dînçer, Erdogan Dînçer ku ew jî beriya 18 salan tevî wê beşdarî refên gerîla bûbû niha di Girtîgeha Tîpa D a Amedê de ye û cezayê hetahetayê xwariye... *RÛPEL -5*



# Elbakê Koma Aştiyê bi girseyî pêşwazî kir

## LI ELBAKÊ PÊŞWAZÎKIRINA BI HEYBET

Endamên Komên Çareseriya Demokratîk û Aştiyê yên ji Mexmûr û Qendîlê Nurettîn Turgut, Nizar Buldan, Gulbarah Çîçekçî û Hemiyet Dînçer li Navçeya Elbaka Wanê bi gel re hatin cem hev. Endamên Koma Aştiyê ji hêla hezaran kesî ve hatin pêşwazîkirin.

## GELEK SOZAN DIDIN LÊ BI CIH NAYNIN

Girseya mezin pankarta, "Bila nexşerê bê aşkerakirin, operasyon bên rawestandin, ji şer re na aştî a niha" vekir, slogana, "Bijî Serok Apo" kêm nekir. Girse û kom piştre derbasî ber avahiya Rêxistina DTP'ê ya Navçeyê bûn. Endamên komê xîtabî gel kirin... *RÛPEL -5*


ROJEV

24 Mijdar - Sêşem 2009 E-mail: awelat2002@yahoo.com Buha: 50 Ykr Hejmar: 12


## Salvegera 27'ê Mijdarê

31 sal tije bû, em derbasî sala 32'yan dibin.Vê rojê di meşî û dilê gelê me de cihê xwe çêkir û bi kevirê zêrîn xaniyê xwe di dîroka gelê me de ava kir. Êdî ev roj li ba gelê me bûye rojeke pîroz, bûye cejnek, lewma em dikarin ji gelê xwe re bêjin: Cejna we pîroz be! Ji bo çi?..

AHMET AKTAŞ R.5

# BELGEYA QETLÎAMÊ


Rojevê fermana ku ji aliyê Lijneya Wezîran a di 4'ê gulana 1937'ê de di bin serokatiya Ataturk de û bi tevlibûna rayedarên demê civiyayî ya Qetlîama Dêrsimê bi dest xist. Di fermanê de qetlîam gav bi gav hatiye plankirin

## EM BELGEYA 'PIR NEPENÎ YE' AŞKERA DIKIN

Belgeya civîna Lijneya Wezîran a 4'ê gulana 1937'ê ku di bin serokatiya Ataturk de bi rojeva awarte civiyabû ket destê rojnameya Rojev. Bi belgeyê derket holê ku di vê civînê de biryarên girîng ên der barê Qetlîama Dêrsimê de hatin girtin. Di destpêka biryarên ku mohra 'Pir nepenî ye' lê hatiye kirin de gav bi gav Qetlîama Dêrsimê hatiye plankirin û rê û rêbazên wê hatine diyarkirin.

## FERMANA QETLÎAMÊ: BI TUNDÎ ÊRÎŞÎ WAN BIKIN

Fermana Qetlîamê wiha ye: "Hêzên hatine berhevkirin dê bi riya şîdet û êrîşeke tund heta ber xeta Qişle (Nazimiye), Keçizeken (Bora Jêr), Sîn û Karaoglanê biçin. Gelê ku li vê deverê serî hildaye dê bê berhevkirin û ji bo hin deverên din bê neqilkirin. Û ji bo pêkanîna vê berhevkirinê dê rêbaza serdagirtina gundan pêk bê. Ji bo niha neqilkirina 2 hezar kesî hikûmet amade ye... *R.5*


"1937 YILINDA YAPILAN TUNCELİ
TENKİL HAREKÂTINA DAİR
BAKANLAR KURULU KARARI
GAYET GİZLİDİR"

ÇOK GİZLİ

4 Mayıs 1937

Başvekâlet
Kararlar Müdürlüğü
Sayı:

**Son günlerde Tunceli'de vukua gelen hadiselere dair raporlar 4.5.1937 tarihinde Atatürk'ün ve Mareşal'in huzurları ile tetkik ve mütalaa edilerek aşağıdaki sonuca varılmıştır:**

1. Toplanan kuvvetlerle Nazımiye, Keçizeken (Aşağı Bor), Sin, Karaoğlan hattına kadar, şedit ve müessir bir taarruz hareketi ile varılacaktır.

2. Bu defa isyan etmiş mıntıkadaki halk toplanıp başka yere nakil olunacaktır. Ve bu toplama ameliyesi de köylere baskın edilerek hem silah toplanacak, hem bu suretle elde edilenler nakledilecektir. Şimdilik(2000) kişinin nakli tertibatı hükümetçe ele alınmıştır.

Mülahaza:

Sadece taarruz hareketiyle ilerlemekle iktifa ettikçe isyan ocakları daimi olarak yerinde bırakılmış olur. **Bunun içindir ki, silah kullanmış olanları ve kullananları yerinde ve sonuna kadar zarar vermeyecek hale getirmek, köyleri kâmilen tahrip etmek ve aileleri uzaklaştırmak lüzumlu görülmüştür.**

Not: Malatya'dan ve Ankara'dan gönderilen kuvvetlerin cepheye vasıl olmaları ve cephedeki kuvvetlerin ufak tefek talimleri ve istirahatları ve bundan başka Diyarbakır'dan gelecek taburun tevzifi, bütün bunlar düşünülerek bir hafta sonra yani 12 Mayısta ileri harekete başlanabileceği anlaşılmaktadır.

Not: **Paraya acımaksızın içlerinden çok adam kazanıp kullanmaya çalışmak lazımdır.**

**Aslı gibidir**



## 'Şertên Ocalan hinceta aloziyê ne'

Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk û Parlamenterên DTP'ê, di çarçoveya gera Herêma Egeyê de çûn bajarê Aydinê û ji aliyê 10'ê kesî ve hat pêşwazîkirin. Turk bal kişand ser rewşa Ocalan û wiha got: "Birêz Ocalan 11 sal e bi tena serê xwe di Girava Îmralî de dimîne. Li şûna ku şert û mercên Ocalan baş bikin odeya wî ji 11 metreqareyan daxistin 6 metreqareyan. Ma ev yek ne tevlihevî sorkirin ?..

NÛÇE R4

## 'Rewşa me û kurdan dişibe hev'

Rojnamevanê baskî, Urtzi Urrutikoetxea got ku dema li Ispanyayê dinêrin wekî hemû welatên din ên Ewropayê ye lê dema ku bi zimanê baskî be rewş tê guhartin û zext zêde dibin...

NÛÇE R8




## Lorikên dayika Ceylan Onkol kezeb şewitandin

*Komîsyona Mafên Zarokan a Amedê, têkildarî 20'ê Mijdarê Roja Mafên Zarokan, malbat û gora Ceylan Onkol a 12 salî ku ji aliyê leşkeriyê ve hatibû qetilkirin ziyaret kir. Dayika Ceylan Onkol Salîha Onkol li ser gora keça xwe ya biçûk lorîk lorand û ev yek di nava endamên heyetê de bû sedema demên hestiyar...* *RÛPEL - 3*

## 'Dêrsimê' CHP ji binî ve hejand

Bertekên li dijî gotinên Cîgirê Serokê Giştî yê CHP'ê Onur Oymen ên têkildarî "Komkujiya Dêrsimê" ku li Parlamentoya Tirkiyeyê anîbûn ziman didomin. Li Dêrsimê 3 şaredar, parlamenterên berê û endamên Meclîsa Giştî ya Bajar jî di nav de 100 kesan ji CHP'ê îstifa kir... *RÛPEL - 5*

## Ji bajarê Wanê jî aciziya ji CHP'ê

Serokê Giştî yê KIR-DER'ê Yusuf Abî, têkildarî axaftinên Alîkarê Serokê Giştî yê CHP'ê Onur Oymen ên di 10'ê mijdarê yên der heqê "Komkujiya Dêrsimê" de kirî li avahiya komeleyê daxuyanî da çapemeniyê. Abî bertek nîşanî daxuyaniyên Oymen da... *RÛPEL - 5*

## Saziyên elewiyan piştgirî da îstîfayan

Rêxistinên elewî û Dêrsimê piştgirî dan 300 kesên bi armanca şermezarkirina polîtîkayên CHP'ê yên der barê elewî û kurdan de ji CHP'ê îstîfa kirin. Rêxistinên Dêrsimê û elewiyan daxuyandin ku li benda zêdebûna îstîfayan in û bang kir ku tu kesê bi heysiyet di CHP'ê de nemîne.

www.arsivakurdi.org

Cemal Şerîk

# Lîstika AKP'ê ya nû

Piştî hevdîtinên ku di 10'ê mijdarê de li meclisê dest pê kirin, ji aliyê AKP'ê ve mîtîng têne lidarxistin. Jixwe serokwezîrê tirk R.T. Erdogan di axaftina xwe ya meclisê de daxuyand ku bajar bi bajar dê li Tirkiyeyê bigire û mîtîngan li dar bixe.

Di van mîtîngan de naveroka axaftinên R.T. Erdogan ên ji bo gel pirsgirêka kurd bû. R.T. Erdogan di axaftinên xwe de partiyên din rexne kir û der barê pirsgirêka kurd de çi difikire vegot. Bi vî rengî raya giştî ku ne biyanî van gotinan bû careke din ji devê xwediyê wê bihîst. R.T. Erdogan nêrînên xwe yên çi li meclisê çi li mîtîngan, ligel ku berê bi wesîleyên cuda nêrînên xwe vegotibûn jî heman nêrînên xwe careke din dubare kir. Ev yek jî di heman demê de bi xwe re di serê mirovan de bû sedemê gumanan. Gelo R.T. Erdogan çima hewcedarî li dar xistina bi rêze mîtîngên wiha dît. Çunkî li meclisê hevdîtin çêbûn û nêrînên li wir hatibûn ziman di televîzyonan de hate weşandin û ji bilî vê nîqaşên bi rojan hatibû kirin di rojeva raya giştî de hatibû hiştin. Heta rabirdûyeke vê ya ku diçe beriya hevdîtinên li meclisê heye. Li gel vê yekê R.T. Erdogan hewcedarî bi lidarxistina mîtîngan dît, derket pêşberî gel û heman tişt dubare kir. Xuya dike sedemên cuda yên R.T. Erdogan heye ku van mîtîngan li dar bixe. Tu pirsgirêkek e R.T. Erdogan tuneye ku gel rake serhildanê. Çunkî ew niha serokwezîrê welat e. Dîsa li hemberî wî şîdetek bi pêş neketiye ku gel rake serhildanê û xwe bi vî rengî biparêze. Ligel van hemû tiştan R.T. Erdogan hewcedarî bi rêze mîtîngan wiha dîtiye.

Dema em şertên Tirkiyeyê di nav de ye li ber çavan bigirin, lukseke serokwezîrê welatekî tune ye ku dema xwe ya zêde bi lidarxistina mîtîngan re derbas bike. Çunkî gel jê ne gotinan kar dixwaze. Dema di nava her du hilbijartinan jî diyar e. Ji ber vê yekê jî rojên hejmarî bi derbaskirina mîtîngan ji bo hikûmeta tê wateya windakirina demê. AKP ku cara sêyemîn hikûmet ava kiriye, di sala sêyemîn de mîtîngên wiha li dar dixe.

Kesek nikare îdia bike ku R.T. Erdogan vê yekê nizane. Ji bo bidawîkirina dema wî re salek û nîv heye, gerek bi hişmendiya ku tiştên cuda bê kirin tevbigere. Lê wiha nekiriye. Berovajî vê tercîha ku biçe qadan kiriye. Ev mijareke ku divê li ser bê sekinîn.

Kî çi dibêje bila bêje, berdevkên AKP'ê her çiqas red dikin bila bikin, ji ber R.T. Erdogan berê xwe daye qadên mîtîngan, agahiya ku Tirkiye dikeve nava pêvajoyeke bi lez dide. Nîşaneyên xurt ku AKP amadekariyên hilbijartineke serdest dike derketine holê. Ev yek ji aliyê raya giştî ve gerek bi baldarî bê şopandin. Heke AKP bi hilbijartineke serdest bê rojevê dê kesek nikare xwe ji matmayînê rizgar bike.

Hilbijartineke pêşwext ji partiyên din zêdetir dê kêrî AKP'ê bê. AKP ji dema dihat xwestin zûtir deşîfre bû û taybetmendiya xwe partiyeke ku ji aliyê klîka dewletê ve tê tercîhkirin winda kir. Her diçe hêza wê kêm dibe. Di hilbijartineke ku di dema xwe de pêk bê, wê gavê pir lawaz xuya dike ku bigihêje hejmara parlamenterên niha li meclisê ne. Ji ber vê rewşê ne mumkûn e ku AKP li benda dema hilbijartinê bimîne. AKP partiyeke wiha ye ku di hilbijartinan de teqez divê qezenc bike kiriye hedefa xwe. Encameke cudatir qebûl nake. Heke ji hikûmetê dûr bikeve, ditirse ku aqûbeta hatiye serê ANAP'ê bê serê wê jî. Wisa tê fêmkirin ku îhtimala R.T. Erdogan ji ber vê sedemê berê xwe daye qadên mîtîngan gelekî xurt e.

Partiyeke weke AKP'ê ku qebûl dike pirsgirêka kurd polîtîkaya dewletê ye û nêzî çareseriya pirsgirêka kurd nabe; hilbijartineke pêşwext û serdest xuya dike. Ji bo vê jî ji niha ve gerek amadekarî hebin.

AKP ne partiyeke wiha ye ku li dijî polîtîkayên dewletê bixwaze pirsgirêka kurd çareser bike. Di bingeha polîtîkayan de polîtîkayên înkar û îmhayê ku li gorî şertên îro bê amadekirin û berdewamkirin heye. Partiyeke ku xwedî taybetmendiyeke wiha ye bi amadekariyên hilbijartineke nû li hemberî kê, bi kîjan armancê bîne rojevê ne tiştekî ku nayê fêmkirine.

Pirsgirêkeke AKP'ê ya li hemberî MHP'ê an jî CHP'ê dê qezenc bike tune ye. Jixwe partiyên ku em behsa wan dikin derdekî wan ê qezenckirinê jî tune ye. Van partiyan bi tevahî bandora xwe winda kirine û bi zor ê li ser piyan dimînin. Ji ber vê yekê hebûna van partiyan di her şert û mercî de ne li dijî zirara AKP'ê be ne, berovajî vê ji bo berjewendiya wê ne. AKP bi teşhîrbûna van partiyan xwe li ser piyan digire û li hemberî gel weke tercîhekê dimîne û dixebite. Ev rastiya heyî di nava xwe de AKP hilbijartineke serdest dixwaze li hemberî kê pêk bîne dihewîne.

AKP dixwaze li hemberî hêzên demokrasiyê hilbijartineke serdest pêk bîne. Ev yek divê bê dîtîn û li gorî wê amadekarî bêne kirin. Ev amadekarî jî divê ji niha ve bê destpêkirin. Lê ev amadekarî ne taklîdeke R.T. Erdogan be. Çunkî ew li ser hikûmetê ye û bi xwarina ranta wê xwe li ser piyan digire û amadekariya hilbijartinê dike. Helbet hêzên demokrasiyê jî dê derkevin qadan, pêşandanan li dar bixin û mîtîngan pêk bînin. Belkî ji AKP'ê hêj zêdetir jî derkeve qadan. Lê hêzên demokrasiyê ne derfet ne jî dema wan heye ku weke R.T. Erdogan û AKP'ê tevbigerin. Tekane tiştekî ku bikin heye; ew jî rêxistinkirine, gel li gorî rêxistinkirina xwe tanzîm bike, gel bi hişmendiyê bistrê û bike îrade. Bikeve nava xebatekê ku gel karibe tercîha xwe ya esasî diyar bike.

# Di dîroka PKK'ê de partîbûyîn

Paradîgmaya dewletparêz, desthilatparêz û şerparêz mahkûm kiriye, li şûna wê paradîgmaya civaka demokratîk bi pêş xistiye. Li dijî zîhniyeta desthilatparêz-şerparêz xeta parastina rewa hatiye bipêşxistin

DURAN KALKAN




*Bi sedema 1'emîn salvegera Pêngava 15'ê Tebaxê ev afîş di sala 1985'an de hatiye amadekirin.*

Rêber Apo ji bo pêşketinên felsefîk, teorîk û îdeolojîk ên li Îmraliyê pênasaya "pêvajoya vejîna rêbertiya sêyemîn" bi kar anî. Rêber Apo di pirtûka "Parastina Gelekî" de dîroka PKK'ê weke serdema hemleya sê partîbûyînê îfade kir. PKK weke hereketeke ku li ser bingeha hemleya sê partîbûnê bi pêş ketiye û di roja îro de xwe ava kiriye bi nav kir. Weke tê zanîn hemleya partîbûna yekemîn vejîna rêbertiyê û pêvajoya damezirandina PKK'ê, li hemberî sîstema înkar û îmhaya Kurdistanê hebûna neteweyî ya gelê kurd ku li ser bingehê sîstema demokratîk û azad avakirina çalakî û rêxistina wê ye.

**Partîbûyîna yekemîn û duyemîn**

Em vê ji aliyekî ve dikarin weke pêvajoya PKK'yîbûna salên 1970'yî îfade bikin. Hemleya partîbûyîna duyemîn li hemberî rejîma leşkerî û faşîst a 12'ê Îlonê li ser bingehê Pêngava 15'ê Tebaxê di pêşketina berxwedana neteweyî de pêvajoya partîbûyînê ye û partîbûyîna gerîla îfade dike. Ev yek jî di têkoşîna berxwedana neteweyî de, di gerîla de partîbûyîn, kadrobûyîn, hêza wê ya teorîk û taktîk îfade dike.

**Hemleya partîbûyîna sêyemîn**

Hemleya partîbûyîna sêyemîn an jî vejîna rêbertiya sêyemîn li hemberî Komploya Navneteweyî, gelê kurd li ser xeta sosyalîzma demokratîk bi pêşxistina têkoşîna azadî, wekhevî û demokrasiyê avakirina Konfederalîzma Demokratîk e. Hemleya partîbûyîna sêyemîn têkoşîna wê ya felsefîk, teorîk, îdeolojîk, siyasî û pratîk dihewîne. Ev yek jî guhertina paradîgmayî ferz dike.

**Ancax bi demokrasiyê pêk bê**

PKK di pêvajoya hemleya partîbûna yekemîn û duyemîn de ji gelek aliyan ve sosyalîzma reel rexne kir û bi awayekî xwe jê dûr xist. Di hemleya partîbûyîna sêyemîn de hem bi awayekî tevahî sosyalîzma reel rexne kir û gihîşt wê merheleyê ku li şûna tiştên şaş dibîne yên nû bi cih bike. Ev yek jî bi xwe gihandina çavkaniya kêmasî û şaşiyên pratîk û ramanî yên sosyalîzma reel, di xwe de avakirina hêza ku dikare sosyalîzma reel bibihurîne îfade dike. Rêber Apo di vejîna rêbertiya sêyemîn de dît ku sekna îdeolojîk a sosyalîzma xwe dispêre rêgezên wekhevî û azadiyê bi navgîna dewletê pêk nayê. Dît ku têgihiştina sosyalîzma xwe dispêre paradîgmaya desthilatdar û dewletparêz wekhevî û azadiyê naafirîne.

Rêgezên wekhevî û azadiyê ne mumkûn e bi navgîna dewletê ku xwe dispêre pêkutî û mêtingeriyê pêk bê. Çawa dibe bila bibe, ji aliyê kê ve bê damezirandin an jî bê birêvebirin, li ser navê çi hereket dike bila bike di rastiya dewletê de pêkutî û mêtingerî heye ji ber vê jî ne mumkûn e wekhevî û azadiyê biafirîne. Li şûna wê rêgezên wekhevî û azadiyê ancax bi demokrasiyê pêk bê.

**Ji tasarûfa dewleta derxist**

Mirov vê yekê dikare wiha îfade bike: Sosyalîzm heta wê demê her tim di tasarûfa dewletê de ye, sosyalîzmê ancax bi navgîna dewletê, bi dîktatoriya prolateryayê pêk bê. Sosyalîzm ji aliyê paradîgmaya dewletparêz hatibû dîl girtin. Rêber Apo dawî li vê dîlgirtinê anî. Sosyalîzm ji destê dewletê derxist û ji tasarûfa paradîgmaya dewletparêz rizgar kir. Demokrasî jî weke sosyalîzmê ji aliyê dewletê hatibû dîlgirtin. Rêber Apo dawî li vê esaretê jî anî û ji tasarûfa dewletê rizgar kir. Destnîşan kir ku demokrasî ne weke tarzekî dewletê an jî tarzê rêveberiyê ye. Demokrasî ji dewletê cudatir sekneke rêxistinî û civakî ye. Di encama vê de demokrasî û sosyalîzm kiriye yek.

Heta vejîna rêbertiya sêyemîn sosyalîzm û demokrasî bi dewletê re yek bû. Rêber Apo hem demokrasî û hem jî sosyalîzmê ji tasarûfa dewletê rizgar kiriye, demokrasî û sosyalîzm kiriye yek. Li şûna sosyalîzma dewletparêz, sosyalîzma demokratîk bi pêş xistiye.

**Xîtabî hemû mirovahiyê dike**

Di hemleya partîbûyîna yekemîn de vejîna rêbertiyê, asta rêbertiyeke neteweyî îfade dike. Li Kurdistanê, heta li bakurê Kurdistanê li ser bingehê rêgezên azadî, wekhevî û demokrasiyê vejîna rêbaza îdelojî û felsefeyeke nû û afirîna rêbertiyeke nû temsîl dike. Di hemleya partîbûyîna sêyemîn de rastiya rêbertiyê li Kurdistanê bi asta rêbertiya neteweyî re li herêmê pêvajoya rêbertiya gelan hatiye jiyîn. Di hemleya partîbûyîna sêyemîn de jî asta rêbertiyê ne tenê rêbertiya gelê kurd an jî gelên li herêmê, gihîştiye asta rêbertiya gerdûnî ku xîtabî hemû mirovahiyê dike çêbûye.

**Sosyalîzma demokratîk**

Paradîgmaya dewletparêz, desthilatparêz û şerparêz rexne û mahkûm kiriye, li şûna wê paradîgmaya civaka demokratîk bi pêş xistiye. Weke alternatîfa pergala civaka dewletparêz a hiyarerşîk, paradîgmaya civaka azadiya zayendî-ekolojîk-demokratîk afirandiye. Li dijî zîhniyeta desthilatparêz-şerparêz xeta parastina rewa bi pêş xistiye. Paradîgmaya civaka konfederal a demokratîk ku xwe dispêre ekolojî û azadiya jinê li hemberî pergala civaka dewletparêz a hiyerarşîk afirandiye. Sosyalîzma demokratîk; ji çalakiyê heta felsefeyê li her qadê bi awayekî tevahî sekna ramanî û zîhniyetê îfade dike. Beriya her tiştî bihurandina materyalîzma qeba û diyalektîka dogmatîk esas digire. Rêber Apo ji vê re dibêje "Tarzê ramana kuantumîk". Sosyalîzma demokratîk, di qada îdelojîk de îfadeya ku rêgezên azadî û wekheviyê û demokrasiyê kirine yek temsîl dike. Xwe dispêre karakterê parveker û beşdar ê demokrasiyê û rêgezên azadî û wekheviyê.

ROJEV

**Zozan Basın Yayın Adına**
**İmtiyaz Sahibi:** Eser UYANSIZ
**Yazı işleri Müdürü:** Mustafa AGGÜL

**Yönetim Yeri:** Diclekent Bulvarı
Termil Apt. Kat:3 No: 9
Kayapınar / DİYARBAKIR
**İdare Tel:** 0 (412) 251 38 88
**Yayın (Weşan)**
**Tel:** 0 (412) 237 48 91
**Fax:** 0 (412) 237 48 89
**Baskı(Çap):**
**Stenbol:** Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basin Yayın Tan. San. Tic. Ltd. Şti., Telsizler Mevki Beşyol mah. Akasya Sok. No:23/A Küçükçekmece / İSTANBUL Tel:0 (212) 580 63 81
**Edene:** Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtçılık, AŞ. İstiklal Mah. İstiklal Cad. No:44 Seyhan/ ADANA
**Yaygın Süreli Yayındır**

# 'Nebaşkirina şertên Ocalan sedema alozî û sorkirinê ye'

**Hevserokê DTP'ê Turk li Aydinê axivî û bal kişand ser nebaşkirina şert û mercên girtîgeha Îmraliyê û got ku girankirina şert û mercên Ocalan sedema alozî û sorkirinê ye. Turk Serokwezîr Erdogan jî rexne kir**

Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk û Parlamenterên DTP'ê, di çarçoveya ger û gesta Herêma Egeyê de çûn Aydinê û ji aliyê 10'ê kesî ve hate pêşwazîkirin. Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk, diyar kir ku bi înkarkirina Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan pirsgirêk çareser nabe. Turk bal kişand ser rewşa Ocalan û wiha got: "Birêz Ocalan 11 sal e bi tena serê xwe di Gireva Îmralî de dimîne. Li şûna ku şert û mercên Ocalan baş bikin odeya wî ji 11 metreqareyan daxistin 6 metreqareyan. Ma ev yek ne tevlihevî sor kirin?"

Heyeta DTP'ê serê sibê li Aydinê ji aliyê 10 hezaran kesî ve hate pêşwazîkirin. Piştî heyetê bi konvoya mezin li nava bajêr tûr avêt derbasî Bajaroka Ovaeymurê bûn. Heyeta DTP'ê li Bajaroka Ovaeymurê ji aliyê 10 hezar kesî ve bi pankarta "Ciwanên ku li Aydinê Azad dibe, amadeye ku ji bo aştiyê şer bike" û "Birêz Hevserokê hûn bi xêr hatine herema me" hatin pêşwazîkirin. Di pêşwazîkirinê de wêneyê Ceylan Onkol ê mezin hate vekirin.


Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk xîtabî girteyê kir. Dema Turk dest bi axaftinê kir dirûşmên "Bijî Serok Apo", "Destê dirêjî DTP'ê bibin dê bişkên" û "Êrîş me têk nabin" hatin berzkirin. Turk, bi kurdî girse silav kir û diyar kir ku gelê kurd ji bo aştî, azadî û demokrasiyê bedelên mezin dane. Turk, da zanîn ku ew ji bo li van bedelan xwedî derkevin têkoşîna xwe dimeşînin û wiha got: "Gelê kurd dê teqez vê têkoşîna xwe bibe serî û dê bi ser bikeve. Ligel hemû astengî, lêdan, kuştin, girtin û pişaftinê kurdan serê xwe netewand. Ji niha û şûnde jî tu êrîş û zordarî nikarin kurdan ji têkoşîna wan dûr bixin. Turk, bal kişand ser 'Komkujiya Dêrsimê û wiha dom kir: "Di serhildana Dêrsimê de ji ber ku nasnameya kurdîtî û elewîtiyê komkujî pêk hat." Turk, hewldan û nêzîkatiya AKP'ê ya li dijî kurdan jî rexne kir û anî ziman ku hewildanên AKP'ê ji xapandinê wêdetir ne tiştekî din e û wiha axivî: "Hikûmet di tasfiyekirina kurdan de israr dike. Em jî ji înkar û îmhayê re dibêjin na. Ji bo çareseriyê duristî û rastî lazim e. Em ji Serokwezîr dipirsin û dibêjin Hûn ê kê tasfiye bikin? Hûn nikarin gelê kurd Tasfiye bikin."

**Înkara PKK'ê û Ocalan...**

Turk di axaftina xwe de diyar kir ku "du serokwezîr hene" yek ji van dibêje bila "Mirin rawestin" yê din dibêje bila "operasyonan bidomin" û ji van serokwezîrane kijan yê rast û yê herêmê ye. Turk, careke din hikûmet hişyar kir û xwest hasasiyetên kurdan li ber çav bigirin Turk wiha dom kir: "Dema ku hûn aktorên vê tekoşînê înkar bikin, partiya me ya 2 milyon deng girtî înkar bikin, hûn di çareseriyê de samîmî nabin. DTP ji bo çareseriyê di nav hemû helwestan daye. Partiyekî ji bo çareseriyê projeyên xwe dana ye holê ye. Vîna gel e. Hûn nikarin vê partiyê înkar bikin. Ez dibêjin dema ku hûn PKK'ê û Birêz Abdullah Ocalan înkar bikin hûn nikarin vê pirsgirêkê çareser bikin. Dema ku em vê yekê dibêjin partiyên din giliyan li me dikin ku di bêjin çareseriyê li ciheke din digerin. Lê em ya rast dibêjin. Partiye me li hemberî pevçûna di gelên bira ne. Lê, kurd mualeya kole û began qebul nakin. Em naxwazin ne gerîla ne leşker û polîs bên kuştin. Huquqekî biratiyê heye. Yek du wekî hev qebul bikin hurmetê ji bo yek du birgin. Dema ku ev yek bê kirin dê çareserî pêkbê. Em li benda şertên jiyana birêz Abdullah Ocalan yê ev 11 sale bi tena serê xwe li Îmraliyê tê girtin sererast bikin bûn. Lê piştî 5 kesên din jî birîne wêrê, hucreya wi ya berê ya 12 metrkare hin pêçûktir kirin û kirine 6 metrekare. Ev nêzîkahiye provokasyon nebe çiye"

**'Em ji girtinê natirsin'**

Turk hikumet bi van gotîne careke din hişyar kir: "Ya hûnê polîtqayên rast danên holê yan jî êdî hûn kurdan bi gotinên xweşik na xapînin." Turk destnişan kir ku ev têkoşîn tenê ya Hevserokên DTP'ê nîne û wiha domand: "Li vir 200 hezar kurd dijîn. Ev yeke ji dibe 100 hezar deng. Lê dema ku em di hilbijartinan de 20-30 hezar dengan bistinin dê çawa serbikevin? Divê em vê têkoşînê bikin ya gel û divê em bi serbikevin. Hûn dê di sandiqê de vina xwe danin holê." Turk, êrîşa li dijî konvoya wan hati jî bi birxist û diyar kir tu caran êrşên bi vî rengî wan têk nabin û wiha berdewam axaftina xwe kir û got, em li gorî dek û dolabên wan tevnagerin." Turk, da zanîn ku çareseriyekî bê kurd û bê muxatab pêknayê û wiha got: "Em amadene ji bo têkoşînê. Lê heya hûn muxatabên pirsgirêkê li ber çav negirin hûn nikarin tu çareseriyan pêk bînin. Bêyî kurd tu çareserî pêk nayê. Wekî minakên cihanê yên mina Afrîkaya Başûr, Îspanya û Îrlanda yê heya muhatabên pirsgirêkên neyên cem hev tu çareserî pêk nayê. " AYDIN (DÎHA)



Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk li Aydinê êrîşa li Îzmîrê li hemberî konvoya DTP'ê pêk hati şermezar kir û anî ziman ku ew ê ji meşa azadiyê venegerin.

## TEV-ÇAND'ê 27'ê Mijdarê li gel pîroz kir

Komîteya Çand û Hunerê ya KCK'ê, TEV-ÇAND'ê bi daxuyaniyekê 31'emîn salvegera damezrandina PKK'ê pîroz kir û da zanîn ku bi têkoşîna 31 salan, gelê kurd ji bilî dagirkeriya eskerî, komkujiyên kulturî jî berteref kirine.

TEV-ÇAND'ê, destnîşan kir ku di 31'emîn salvegera damezrandina PKK'ê de, gelê kurd gihaye qonaxa ku li îradeya xwe xwedî derbikeve û li dijî hêzên red û înkarê hebûna xwe bide erêkirin.

TEV-ÇAND'ê, anî ziman ku ji bo jiyaneke bi rûmet, pêdivî bi têkoşîna berdewamî û rêxistiniya pirhêlî heye û got: "Em salvegera damezrandina tevgera kurd, li serokatiya gelê kurd, li gelê kurd, li rêheval û mirovahiya pêşverû pîroz dikin. Em, şehîdên azadiyê bi bîr tînin û dibêjin ku di riya wan de û bi dilsoziya li hemberî bîranîna wan, em ê li dijî dagirkeriya dijmin a li ser çanda kurdî, têkoşînê xurt û bi hêz bikin."

TEV ÇAND'ê, da zanîn ku damezandina PKK'ê, ji bo çanda kurd mîladek e û got: "Yek ji destkeftiyên herî giring ên têkoşîna PKK'ê eniya çand û huner e û em jî wateyeke giring û mezin didine vê eniyê."

TEV- ÇAND'ê, bal kişand ser rola Serokatiya Tevgera Azadîxwaz a Gelê Kurd Abdullah Ocalan û got: "Di destpêkê de kesayetiya azad hate afirandin. Piştre hişmendiya xwedîderketina li îrade û şêwaza jiyana li ser bingeha kulturê hat afirandin. Van jî, qonaxa îro ya serketinê derxistin holê. Ev jî navê rastiya gelê kurd, erêniya hebûna gelê kurd e." BRUKSEL (ANF)

## Li Ewropayê pîrozbahiyên salvegerê

Salvegera damezrandina PKK'ê li gelek deverên Ewropa hat pîrozkirin. Li bajarê Rennesê ya Fransa û li bajarê Stuttgartê ya Almanyayê pîrozbahiyên salvegera damezrandina PKK'ê pêk hatin. Her wiha li Welsa Awusturyayê jî salvegera PKK'ê hate pîrozkirin.

Li bajarê Stuttgartê ji bo 31'emîn salvegera damezrandina PKK'ê şeveke pîrozbahiyê hate lidarxistin û hat diyarkirin ku hezar û 500 kes tevlî pîrozbahiyê bûn. Di şevê de nûnerê kordînasyona CDK'ê axivî û got, 'di demeke ku asîmîlasyon û tunekirina gelê kurd gihabû asta herî dijwar, 27'ê Mijdara 1978'an PKK'ê damezrandina xwe ragihande raya giştî." Di şevê de peyamên pîrozbahiyê yên Yekitiya Xwendekarên Kurd, ya komîsyona piştgiriya malbatên şehîdan û gelek saziyên din jî hatin xwendin. Di bernameya çandî ya şevê de jî, Hozan Dîno, hunermend Sîmar, Sosin, Koma Nergiz, Koma Silbus û Tarî derketin ser dikê, sînevîzyon û govend hatin pêşandan. Li bajarê Rennesê jî, bi heman armancê çalakiyek li dar xist. Nêzî 300 Kurdistaniyan beşdarî şeva pîrozbahiya damezrandina PKK'ê bûn û hunermendên herêmî derketin ser dikê.

Yek ji pîrozbahiyên salvegera damezrandina PKK'ê jî li bajarê Welsê ya Awusturyayê bû. BRUKSEL

## MEYA-DER'ê ji bo Ocalan 58 name bi rê kirin

Endmên Komeleya Piştevaniya Xizmên Windayan a Mezpotamyayê (MEYA-DER), bi boneya pîrozbahiya Cejna Qurbanê 58 name ji Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan re şandin. Endamên MEYA-DER'ê beriya ku nameyan bişînin daxuyanî dan çapemeniyê. Li ser navê MEYA-DER'ê Mehmet Alî Turk, li ber postexaneyê daxuyanî xwend û diyar kir ku ji bo Cejan Qurbanê ya Ocalan pîroz bikin dê 58 name ji Girava Îmraliyê re rê bikin. Turk, xwest ku Cejna Qurbanê bibe cejna aştî û biratiyê. Piştî daxuyaniyê endamên MEYA DER'ê 58 name bi riya postexaneyê ji Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan re şandin. RIHA

## Têkiliya hikûmetê û Gulen pirsî



Parlamenterê DTP'ê yê Dêrsimê Şerafettîn Halîs, ji Serokwezîr Recep Tayîp Erdogan têkiliya Hikûmeta AKP'ê û Cemaeta Fethullah Gulen pirsî.

Parlamenterê DTP'ê yê Dêrsimê Şerafettîn Halîs, bi boneya bersivandinê pirsnameyek bi nivîskî da Serokwezîr Recep Tayîp Erdogan û xwest têkiliya Hikûmeta AKP'ê û Cemaeta Fethullah Gulen Çi ye? bê bersivandin.

**Têkiliya we çi ye?**

Halîs diyar kir ku di 5'ê mijdarê gera Serokomar Abdullah Gul de Wezîrê Dewletê Faruk Çelîk jî çû Dêrsimê û Çelîk beşdarî vekirina Koleja Taybet a Munzurê ku girêdayî Cemaeta Fethullah Gulen e bibû.

***Halîs ji bo bersivandinê ev pirs pirsîn:***

" *Têkiliya hikûmeta we û cemaeta Gulan bi hev re çi ye? Ger ku têkiliya hikûmetê tunebe, çima Wezîrê Dewletê birêz Faruk Çelîk beşdarî vekirina koleje bû û bi kîjan navî beşdarî Koleja Taybet a Munzurê bû.?

* Polîtîkayên Fethullah Gulen ên ji bo pişaftina Elewiyan rast in?

* Ger ku polîtîkaya pişaftina elewiyan rast be, wê demê li hemberî vê polîtîkayê tu hewldanên hikûmetê hene. Li hemberî vê yekê çi dike?" ENQERE



# Fermana Qetlîama Dêrsimê

**Rojnameya me fermana ku ji aliyê Lijneya Wezîran a di 4'ê gulana 1937'ê de di bin serokatiya Ataturkî de civiyayî ya ji bo Qetlîama Dêrsimê bi dest xist. Di fermanê de qetlîam gav bi gav hatiye plankirin**

Adil ZOZANÎ - AMED

Belgeya civîna Lijneya Wezîran a 4'ê gulana 1937'ê ku di bin serokatiya Ataturk de bi rojeva awarte civiya bû me bi dest xist. Di vê civînê de biryarên girîng ên der barê Qetlîama Dêrsimê de hatin girtin. Di destpêka biryarên ku mohra 'Pir nepenî ye' lê hatiye kirin de gav bi gav Qetlîama Dêrsimê hatiye plankirin.

**Fermana Qetlîamê**

Lijneya Wezîran a Dewleta Tirk di 4'ê gulana 1937'ê de di bin serokatiya Ataturkî de bi rojeva Dêrsimê civiya. Li ser belgeya ku di arşîvên meclîsê de bi mohra 'Pir nepenî ye' veşartin de gav bi gav Qetlîama Dêrsimê hatiye plankirin.

**Beriya qetîamê rapor**

Di destpêka belgeyê de tê gotin ku raporên der barê bûyerên li Dêrsimê diqewimin de hatine amadekirin û di çarçoveya raporan de biryar hatine girtin. Civîn di 4'ê gulana 1937'ê de bi serokatiya Ataturkî civiya ye û bi giştî Serhildana Dêrsimê hatiye nirxandin. Ligel ku lijneya wezîra tim di bin serokatiya serokwezîr de pêk tê, di vê civînê de serokatiya civîna lijneyê Serokomar Ataturkî kiriye. Ev jî nîşan dide ku civîn bi rojeveke awarte pêk hatiye.

**Gav bi gav qetîam**

Di belgeya ku mohra 'pir nepenî ye' lê hatiye kirin de bi du xalan biryarên Lijneya Wezîran hatine dayîn û di dewama biryaran de raveyek û jêrenotek hatiye dayîn. Biryarên Lijneya Wezîran a 4'ê gulanê 1937'ê wiha ne:

"**1-** Hêzên hatine berhevkirin dê bi riya şîdet û êrîşeke tund heta ber xeta Qişle (Nazimiye), Keçîzeken (Bora Jêr), Sîn û Karaoglanê biçin.

**2-** Gelê ku li vê deverê serîhildaye dê bê berhevkirin û ji hin deverên din bê qeqilkirin. Û ji bo pêkanîna vê berhevkirinê dê rêbaza serdagirtina gundan pêk bê, hem dê çekên wan bên berhevkirin û hem ên tên bi dest xistin dê bêne neqilkirin. Ji bo niha qekilkinina (2000) –2 hezar- kesî ji aliyê hikûmetê hatiye tedbîqkirin.

***Mulahaza (Raveyek):***

"Dema bi demê bi rêbaza êrîşkariyê tevbigerin, çiqas pêşveçûn çêbibe jî bingehên serhildanê bi awayekî domdar li cihê xwe dimînin. Ji ber hindê pêdivî jê re hatiye dîtin ku yên çek bi kar aniye û bi kar tînin di cih de divê bînin rewşa ku tu carî nekaribin zerarê bidin, bi giştî gund bêne tehrîbkirin û malbatên wan bêne dûrxistin.

***Jêrenot:*** Tê texmînkirin ku hêzên ji Enqere û Meletiyê li eniya şer mahir bibin û hêzên li eniya kêmasiyên xwe yên bi biçûk serober bikin û ji bilî wan cihkirina tabûra ku dê ji Amedê bê, di 12'ê gulenê de dikare livbazî bê destpêkirin.

***Jêrenot:*** Bêyî ku serfkirina pere li ber çavan bê girtin divê xebata ji bo destxistina pirtir kesan bê kirin."


Mustafa Sarigul


Cafer Kirmiziçiçek


Mesut Coşkun


Hasan Guyuldar

# 3 şaredaran ji CHP'î îstîfa kir

Li Dêrsîmê 3 şaredar, parlamenterên berê û endamên Meclîsa Giştî ya Bajar jî dinav de 100 kesan ji CHP'ê îstifa kir. Li Wanê jî CHP hate protestokirin.

Bertekên li dijî gotinên Cîgirê Serokê Giştî yê CHP'ê Onur Oymen ên têkîldarî "Komkujiya Dêrsîmê" ku li Parlementoya Tirkiyeyê anîbûn ziman didomin. Ji ber ku CHP'ê li dijî Onur Oymen tu helwest negirt, îstîfayên endamên CHP'ê zêde bûn. Li Dêrsîmê, Şaredarê Pilemurê Mesut Coşkun, Şaredarê Pulurê Mustafa Sarigul û Şaredare Navçeya Qişleyê ku piştî hilbijartinê beşdarî CHP'ê bû Cafer Kirmiziçîçek, Palamenterê CHP'ê yê Dêrsîmê yê Serdema 22'yemîn Hasan Guyuldar, endamên Meclîsa Gişti yên Bajar û gelek endamên partiyê yên din jî di nave 100 kesan ji CHP'ê îstifa kir. Berê jî rêxistinên navçeyên Mazgêrd û Qişleyê ji CHP'ê îstifa kiribûn.

**Li Wanê protesto**

Serokê Giştî yê KIRDER'ê Yusuf Abî, têkîldarî axaftinên Alîkarê Serokê Gişti yê CHP'ê Onur Oymen ên di 10'ê mijdarê yên derheqê "Komkujiya Dêrsîmê" de kirî li avahiya komeleyê de daxuyanî da çapemeniyê. Abî diyar kir ku di 10'ê mijdarê de niqaşên li meclisê de hatine kirin tu tişt ji bo kurdan dernekevtiye. Abî, ani ziman ku bi mehane hikumeta AKP'ê gel xapandiyê. Abî, helwesta CHP'ê ya têkîldarî pirsgirêka kurd jî rexne kir û wiha got: "Di hevdîtinên 10'ê mijdarê de CHP'ê bi pankartan û hinek kesên anîne salonê gavên çareseriyê provoke û sabote kiriye. CHP, ev 75 sale dengên gelên çepkir û elewiyên kurd digire. Ruyê xwe yê nijadperest û şowen nîşan daye. Bi axaftina Onur Oymen, bi salane CHP'ê çawa gel xapandiye derketiye holê. Serokê Giştî yê CHP'ê Denîz Baykal çawa gelê kurd înkar kiriye di demên dawi de derketiye holê û pêşveçûnên çareseriyê jî sabote kirine. Em helwesta CHP'ê û rêveberên wê şermezar dikin." **DÊRSÎM / WAN**

# Elbakiyan qasidên aştiyê hembêz kirin

Komên Çareseriya Demokratîk û Aştiyê yên ji Mexmûr û Qendîlê hatîn li Navçeya Elbaka Wanê ji hêla hezaran kesî ve hatin pêşwazîkirin. Hamiyet Dînçer ku 18 sal berî niha kurê xwe yê 4 mehê hêla û beşdarî PKK'ê bû bi malbata xwe re hate cem hev. Gihiştina malbata Dînçer bu sedema demên hestewar.

Endamên Komên Çareseriya Demokratîk û Aştiyê yên ji Mexmûr û Qendîlê Nurettîn Turgut, Nizar Buldan, Gulbarah Çîçekçî û Hemiyet Dînçer li Navçeya Elbaka Wanê bi gel re hatin cem hev. Kom li daketina Elbakê ji hêla Şaredar Îhsan Guler, rêvebebrên DTP'ê û bi hezaran kesî ve hatin pêşwazîkirin. Girseya pankarta, "Bila nexşerê bê aşkerakirin, operasyon bên rawestandin, ji şer re na aştî a niha" vekir, slogana, "Bijî Serok Apo" kêm nekir. Girse û kom piştre derbasî ber Rêxistina DTP'ê ya Navçeyê bûn. Li vir Serokê Rêixstina DTP'ê ya Navçeya NAvendî Mehmet Kurt, ji ber coşa gel a pêşwazîkirinê spasiyên xwe kirin.

**Em ji bo azadiyê hatine**

Endama Komê Hamiyet Dînçer diyar kir ku 18 sal berî niha zarokê xwe dema 4 mehî bûye hiştiye û beşdarî refên PKK'ê bûye. Dînçar diyar kir ku piştî 18 salan vegeriya ye û wiha axivî: "Ji ber vê girseyê ez gelek hestewar û bi coş im. Em ji bo azadî û aştiyê hatin. Hind derdorên hêza kurdan li ber çavan nagirin û dixwazin li ser şer û xwînê rantê bi dest bixin, hatina me cuda şîrove dikin. Em ne ji bo şov kirine, ne ji bo teslîmiyetê hatin. Em ji bo aştî û azadiyê hatin. Ji bo rawestandina şer em dê zêdetir bitêkoşin. Tenê dayîk dikarin şer rawestînin û xwînê bi dawî bikin. Ez bang li hemû dayîkên kurd û tirk dikim ji bo aştiyê têbikoşin." Nurettîn Turgut jî diyar kir ku kurdan koçî gelek cihên cîhanê kirene û ev tişt gotin: "Piraniay me neçarî derbasî Kurdistana Federal bû. Me gelek êş kişandin. Me gelek zilm ji cerdevanan dît. Gelek kes hatin qetilkirin. Em dixwazin bi awayek azad vegerin. Ku dixwazin em vegerin divê derfetên perwerdehiya 5 hezar zarokên me yên bi zimanê zikmakî perwerdehî dîtine, bi afirînin. Em dixwazin bi nasnameya xwe ya kurdî ya azad li ser axa xwe bijîn. Ku ev bi cih bên em dê vegerin." **WAN**

## Piştî 18 salan...

***HAMIYET*** Dînçer ku zarokê xwe yê 4 mehî, 18 sal berî niha hişt û bi hevserê xwe re beşdarî refên PKK'ê bû, li avahiya DTP'ê bi malbata xwe re hate cem hev. Hevdîtina piştî salan bû sedema demên hestewar. Dînçer diyar kir ku ew di demek cerdevanî û eşîrvanî bûye pergal û riyên siyaseta demokratîk nemayî de derketiye û wiha got: "Îro ev coşa gel ez gelek hestewar kirim. Xwedîlêderketine gel a nûnerên xwe hêza me zêde dike. Ev xwedî lê derketine gel berpirsyariya me zêdetir dike. Em jî ji bo ev hêviya wan vala dernekeve dê her tim bixebitin." Hevserê Hamiyet Dînçer, Erdogan Dînçer jî piştî ku tevli nava refên gerîla bû ji bo têkoşîn û xebatên siyasî vegeriya Bakur. Di dema xebatan de ew hate girtin û niha di Gîrtîgeha Tîpa D a Amedê ye û cezayê îdamê li wî hatiye birîn.





**Ahmet Aktaş**

saktas25@hotmail.com

## 27'ê Mijdarê

Vê rojê di mejî û dilê gelê me de cihê xwe çêkir û bi kevirê zêrîn xaniyê xwe di dîroka gelê me de ava kir.

Êdî ev roj li ba gelê me bûye rojeke pîroz, bûye cejnek, lewma em dikarin ji gelê xwe re bêjin: Cejna we pîroz be!

Ji bo çi?

Ji ber ku, di vê rojê de, hejmerak xortên xwendekar, zana, hişmend, mêrxas, dilsoz û ji xwe bawer li gundê Fîsê yê Amedê civiyan û biryara avakirina saziya rizgarî û azadiya Kurdistanê standin, dem: 27'ê Mijdara sala 1978'an.

31 sal tije bû, em derbasî sala 32'yan dibin.

Bi ziman gotina vê hevokê hêsan e, lê bi jiyan gelek û gelek gelek giran e.

Ji ber ku tije ked û xwîn, hêsir û hesret, xweşî û reşî, bi bextî û bêbextî, xeşîmî û serwextî, jiyan û zîndan, berxwedan, serîhildan û...e.

***

Zivistan e, em li derdorê gundê Siltokê yê Dêrika Çiyayê Mazî ne, hinek kaxizê nivîskî di destê Hayrî Durmuş û Ferhat Kurtay de ye û germa germa van nivîsan di ber çavan ra derbas dikin û bi taybetî li ser hevokekê guftûgo sor bûye û 'şerekî şêrin' li holê ye.

Nîqaşa germ ya nava me li ser navê partiyê ye.

Hevlê Hayrî dibêje, em di kongreyê de, weke navê Partiya Vietnamiya em hemfikir bûn, lê sedî sed me negot bila ev nav be û eger ev nav were pejirandin/qebûlkirin jî, nabe bi tirkî (Kurdistan Îşçî Partîsî/KÎP) be.

Li ser nav ku di jiyanê de, her dem bi kurdî be jî hem fikir bûne li kongreyê, lê belê vê carê divê ku bi Kurdiyeke rast û bê şaşî bête nivîsandin.

Hevalê Hayrî dibêje me gotiye kurdiya hevalê Ferhat baş e em ê biçin li wira sererast bikin û bi rastî jî hate sererastkirin û ji wê rojê heta niha û ez bawer dikin heta ku Kurdistan Azad bibe jî ev nav dê her dem bi rûmettir bijî: PARTIYA KARKERÊN KURDISTANÊ

***

Sala borî, sala derbasbûyî, li ser salvegera partiyê em dîsan weke caran diaxivîn, min got salên min li dor 32-33'yan e.

Hinek ji cimhetê keniyan got ev çawa/çilo wisa dibe, em zanin tu di ser 55'an re ye.

Min got rast e, heqê we heye, lê heqê min jî heye ku ez wisa bêjim.

Ji ber ku ez bi naskirina vî Rêber û vê Tevgêrê re hişyar bûm ji xewa mirinê, bi rastî min çavê xwe bi vanan re li jiyanê vekir û ez bi rastiya jiyanê û cîhanê hesiyam.

Lewma ez jiyana berî vê jiyan najimêrim, min jiyan di sala 1976'an de nas kir û temenê min ê jiyanê ji wê rojê ve dest pê dike.

Ez bawer dikim ev dîrok ji bo gelê me jî wisaye û divê wisa be.

Jiyan xweş e û bi wate ye û bi rûmet e, eger azad be, an jî di nava têkoşîna ji bo azadiyê de be, ji bilî vê jiyan ji me re heram be!

Yê ku ev jiyana bi rûmet bi me daye naskirin, em wan bi bîr tînin û serê xwe li ber giyan û keda wan ditewîne, ji bo ku biryara dîrokî di vê rojê de dane em vê rojê weke cejin li gelê xwe û mirovatiya cîhanê pîroz dikin.

Cejna we a 27'ê Mijdarê Pîroz be!

# Washington Postê AKP rexne kir û got:

# AKP'ê dest bi durûtiyê kiriye

## Rojnameya herî mezin a Amerîkayê Washington Postê di sernivîsa xwe de bal kişand ser durûtiya Erdogan û AKP'ê. Tê gotin Erdogan her diçe dev ji helwesta xwe ya demokratîk berdide

Rojnameya navdar a Amerîkayê Washington Post di sernivîsa xwe de diyar kir ku ew jî tevê nirxandinên rexneyî yên li Serokwezîrê Tirk Erdogan dibin. Hat gotin ku Erdogan ji vir çendsal berê li Washingtonê wek modela demokratîzekirina civaka îslamê dihat qebûlkirin. Lê di nav demê de bi hin polîtîkayên Tirkiyeyê ve nêrîn pûç derket û bi tundî rexne kir.

Rojnameyê ligel ku Erdogan wek 'lehengekî lîberal yê epîk' destnîşan kir jî di sernîvîsa xwe de ew bi tundî rexne kir. Hat gotin ku Erdogan her diçe dev ji hîmê demokratîkbûnê berdide. Tê gotin ku rêzdar Erdogan û partiya xwe demek li Washingtonê ji aliyê gelek kesan ve wek mînaka 'dê çawan misilmanên dîndar siyaseta demokratîk bidin meşandin' dihat nîşandan. Ev îmaj her diçe lezgîntir reş dibe. Tê gotin ku bala Erdogan zêdetir li ser dîktatorên misilman e. Ji bo ku îmaja Erdogan a destpêkê ji binî ve têk neçe ji Erdogan tê xwestin ku dev ji vê baldariyê berde û îtîbarê bi polîtîkayên bêdengîkirina muxalîfan neyne.

**Rêgezên demokratîk dihejin**

Rojnameya Washington Post di sernivîsê de bal dikişîne ser hin polîtîkayên Tirkiyeyê yên balkêş û vê spota "Wisa dixuye ku partiyeke îslamî baweriya wê ya demokrasiyê diheje" derxist pêş. Li vir durûtiya AKP'ê vedibêje. Dide zanîn ku AKP bo ku muxalîfên xwe û leşkeriyê bixe bin kontrola xwe ev rêbaz esas girt. Lê ev kontrol çiqas hat xurtkirin têkiliya wê ya demokrasiyê jî sist bû.




**Endamtiya YE'yê nabe**

Di spoteke din de balê dikişîne ser mohrkirina protokolên Tirkiye-Ermenistanê û hewldanên li ser pirsgirêka kurd. Tê destnîşankirin ku ji bo vê demokrasî hîma esasî ye. Lê di vê der barê de ji rêgezên demokratîk û krîterên Ewropayê dûr dikeve. Ji ber vê jî gumanên li ser gavên ku tên avêtin û sozên ku tên dayîn zêdetir dibe. Rojname vedibêje ku vê geşedanê derfetên endamtiya YE'yê ya Tirkiyeyê ji holê rakiriye.

**Polîtîka 'kirêt' tê meşandin**

Balkêş e ku rojname polîtîkayên Tirkiyeyê yên derve wek polîtîkayên 'kirêt' pêşkêş dike û wiha pê de diçe: "Pêşketina hevkariya bi Îran û Sûriyeyê re, paristina rayedarên sûcdar ên berpirsê tevkujê Sûdan-Darfurê û rexneyên ku li Israîlê tê kirin ji vana çend xal in." Demek berê Serokomarê Sudanê Omer El Beşîr bo ku bê Tirkiyeyê hatibû dawetkirin. Beriya vê jî Beşîr bi carekê hatibû serdana Tirkiyeyê. Ev di qada navneteweyî de ji aliyê demokrat, parêzvanên mafên mirovan ve bi awayekî tund hatibû rexnekirin.

**Helwesta li dijberî medyayê**

Washington Post ji bo dijberiya medya û muxalîfan jî Erdogan rexne dike û balê dikişîne ser cezayên ku li koma Dogan hatiye birîn. Tê gotin ku hikûmet hewl dide medya herî mezin bo ku di weşana xwe de polîtîkayên Erdogan û AKP'ê esas nagire ji holê rake.

Di nivîsê de Erdogan dişibîne "Al Capone" û wiha mijar tê vegotin: "Armanca Erdogan ne ev e ku nelirêtiya bacê rake. Armanca Erdogan ev e ku pêşî li rexneyên rojnameyê yên nûçegihaniyê bigire."

**Medya çavtirsî kir**

Tê aşkerakirin ku medyaya tirk ji ber vê helwestê çavtirsî bûye û bi sedan edîtor û rojname di amadekirina nûçeyan de hesabê vê dikin û bê ku azad tevbigerin nûçeyên xwe amade dikin. Di beşa çapemeniyê de qala girtina rojnameyên kurdî yên wek Azadiya Welat, rojnameya Gunluk û rojnamegerên girtî yên di girtîgehê de ne nekiriye. WASHINGTON

## Hejmara miriyan zêde dibe

Bîlançoya felaketa teqîna di kaneke madenê ya li bakurrojhilatê Çînê her diçe girantir dibe. Li gorî agahiyên dawiyê hejmara kesên mirî gihişte 104'an.

Teqîna li kana li Hegangê 4 roj berê rû dabû û di dema qezayê de 528 karker di kanê de bûn. Piraniya karkeran xilas bûbûn lê hejmara kesên mirî hê jî nediyar e. Lewra her roja derbas dibe, hejmar jî zêde dibe. Hejmara karkerên di qezayê de mirî gihişte 104'an.

Malbatên karkerên mexdûr jî nerazîbûna xwe tînin ziman û dibêjin, ji rayedarên payebilind tu kes nemiriye, bi tenê karker mirine. Ji ber ku rayedar bersivê nadin wan jî malbatên mexdûran gelekî nerazî ne. Polîsan jî hewl da ku pêşiyê li rojnamevanan bigirin ku gazinên malbat û xizmên karkeran qeyd bikin. PEKÎN

## Bêtehamuliya Çînê ya li dij protestoyan

Hikûmeta navendî ya Çînê li dij protestoyên civakî bêtehamuliyê nîşan dide û destûr nade ku xwepêşandaneke ji rêzê jî bê lidarxistin. Mijara trêna ku bi hilma avê dixebite jî yek ji vana ye.

Li Çînê dûrî bajaran, yek ji trênên ku bi hilma avê dixebite hê jî li ser riyên hesinî diçe û tê. Wisa dixuye ku mînaka vê trênê bilî bikaranîna nostaljiya ji bo turîstan li ser erda cîhanê nemaye.

Trên bi komirê di bejahiya bajarê Qîanweiyê ve diçe. Dema ku di nav hawîrdora dar û daristanan de derbas dibe carinan jî hilm û dûxana xwe bi carekê berdibe ser vê rewneqdariya xwezahî.

Ya rastî ev ne dîmeneke nostaljî ye. Ji bo gelek gundiyên herêmî ev trên yekane alava çûn û hatinê ye. Ev trên ji sala 1959'an û vir ve jî nehatiye nûkirin.

Îro li Çînê piraniya bajaran bi riyên hesin ên trênên bi lez bi hev ve hatine girêdan û dîmenê vê trêna bi hilma avê kar dike di cihê Çînê de dema şoreşa pîşesaziyê ya beriya 2 sedsalan a Ingilîstanê tîne bîra mirov.

Trêna mijara gotinê di saetê de xwedî leziya 20 kîlometroyan e. Li herêma navborî a Çînê û her serê sê saetan bi tenê trênek heye. Ev jî bi xwe re dibe sedemê nerazîbûna niştecihên çînî yên li herêmê. Niha çav li rê ye ku riyeke bejahî were çêkirin û ev rê betal bibe. Heta hingî jî gundî neçarî vê trênê ne. QÎANWEIY



## Windahiyên 20 salan ên Israîl û Filistînê

**RÊXISTINA** Mafên Mirovan a Israîlê B'Tselem, di 20'emîn salvegera xwe de hejmara filistiniyên ku di 20 salan de hatine kuştin aşkera kir.

Rêxistinê diyar kir ku ji sala 1989'an û vir de di pevçûnan de 8 hezar û 800 kes mirine, ji vana tenê 483 jî israîlî ne.

B'Tselem destnîşan kir ku di sala 2009'an de hezar û 33 kesên filistînî mirine û ev jî di dîroka 20 salan de, sala herî dijwar a bi xwîn e. Pirtirê vana jî di êrişa sala 2009'an de li Gazzeyê hatine kuştin.

Rêxistinê bal kişand ser hin pêşveçûnên erênî jî û diyar kir ku angaştên der barê îşkenceya filistiniyan jî bi dawî bûne. Li gorî rêxistinê di sala 1989'an de 794 kes û di 2009'an de jî 335 kes hatine binçavkirin.

## Perez peyamek 'xweşbîn' da

Serokomarê Israîlê Shîmon Peres li ser erdê dagirkirî yê filistîniyan ji bo cihûyan lêkirina avahiyan û berdewama înşaetê ya avasaziyê wek pirsgirêkek sivik binav kir. Perez got ku di nav hevdîtinên dualî yên aştiyê de çareseriya vê hêsan e. Perez ev nêrîna xwe li paytexta Misir Qahîreyê di daxuyaniya çapemeniyê ya ligel Serokomarê Misirê Husnu Mubarek de da.



Mubarek jî di daxuyaniyê de xwest ku li ser erdên filistîniyan ji bo cihûyan lêkirina avahiyan bê rawestandin. Lê Israîl ligel hemû bang û daxwazên Amerîka, Misir û Filistînê di nav sînorê sala 1967'an de her diçe ji bo cihûyan lez dide lêkirina avahiyan.

Serokê Rêveberiya Filistînê Mehmûd Ebas jî her ku daxuyanî dide dide zanîn ku Filistîn heta Israîl înşaetên li ser axa filistîniyan didomîne nede rawestandin ji bo aştiyê dest bi hevdîtinê nakin. Ebas wiha vegot: "Ji hêlekê ve dagirkerî didome. Her wiha erdên me bi lêkirina xaniyan tê desteserkirin. Di vê rewşê de kî dikare qala aştiyê bike. Heta ev desteserkirina Israîlê raneweste destpêka hevdîtinên ji bo aştiyê tu wateya wê nîn e."

Perez di daxuyaniya çapemeniyê de li ser leşkerê Israîlê yê dîl Gîlat Şalît jî rawestiya. Diyar kir ku li ser rewşa Şalît geşedanên erênî hene û pêşketin pêk tên. Lê Perez venegot ku ev geşedan û pêşketin çi ne. QAHÎRE

## Bîranîn



Hediye Korhan (Têkoşîn) 24 11 2007

*Dil şewitî mîna find û şîma*
*Ji her derd û kul û xeman*
*Tev heliyam rih tê nemam*
*Xwîn diherike ser axa pîroz*
*Wek rûbar û çeman*
*Dema ez bimirim rojekê*
*Laşê min bibin warê şêrîn*
*Endnîgariya Kurdistan*
*Bigerînin li her çemû kaniyan*
*Lê qet çênekin ji bo min*
*Koşk, qesr û dîwan*

*Min bavêjin navsera çiyayê*
*Botan*
*Li nav teht, şikêr û beran*
*Pêşberê rûezmanê şîn*
*Heyva çardeşevî û stêrkên ciwan*
*Bila bibe axa tevê şehîd û egîdan*
*Ez ê hingê bibim bextiyarê cîhan*
*Wek Ferhadê xweşik,*
*Serhedê lewend*
*Û...*
*Û Têkoşîna dilovan*



Îbrahîm Korhan (Ferhat) 1997

**Li ser navê malbata wan xwuîşka wan Fatma û bavê wan H Mehmet Korhan**

## Li Iraqê çareserî pêk nehatiye

Parlamentoya Iraqê pirsgirêka qanûna amadekariyên hilbijartina giştî ya ku dê di çileya 2010'an de pêk bê dîsa çareser nekir. Piştî ku Parlamenteran di civînê dawî de jî bi hev nekirin ji bo biryarê civîn hate taloqkirin. Alîkarê Serokomarê Sûnî Tariq El Haşimî hefteya borî biryar veto kiribû careke din li parlamentoyê vegerandibû. Rayedarên Komisyona Hilbijartinê ya Iraqê jî diyar dike ku dê bi îhtîmaleke mezin hilbijartin bên taloqkirin. Lê di makeqanûnê de tê gotin ku divê hilbijartin heta 31'ê çileyê pêk bên. BEXDA

www.arsivakurdi.org




## Şîdet bi şanoyê hate şîrovekirin

Meclîsa Jinê ya Bajarê Êlihê, têkildarî recmê 2 hezar îmze kom kirin. Koma şanoyê ya di bin banê BKSM'ê de xebatên xwe dike jî şîdeta li hemberî jinê bi skeçan anîn ziman.

Li Êlihê şahiyên di çarçoveya 25'ê Mijdarê, Roja Têkoşîna li Hemberî Şîdeta Jinê ya Navnetewî, didomin. Di Konê Daxwazan ê Meclîsa Jinê ya Bajarê Êlihê li Kolana Hunerê hate vekirin de li hemberî recmê îmza hatin komkirin. Endamên Meclîsan Jinê ya Bajarê Êlihê diyar kir ku di konê 2 rojan vekirî ma de li dijî recmê 2 hezar îmze hatin komkirin. Ji aliyê din ve koma şanoyê ya xebatên xwe di bin banê Navenda Çand û Hunerê ya Baharê (BKSM) de dike şîdeta li hemberî jinê bi skecan şîrove kirin. Endamên DOKH'ê têkildar 25'ê mijdarê li navenda bajar belavok belav kirin. *ÊLIH (DÎHA)*





# Jin li Parlamentoya Ewropayê dicivin

**Parêzvanên mafê jinan û tevgerên jinan ên cîhanê di 8'ê kanûnê de li Parlamentoya Ewropayê dicivin. Konferans, dê ji jinên ku hatine qetilkirin re bê diyarîkirin. Parlamentera DTP'ê ya Wanê Fatma Kurtulan jî dê tevli konferansê bibe**

Tevgerên jinan ên cîhanê û parêzvanên mafên jinan dê di 8'ê kanûnê de li Parlamentoya Ewropayê bicivin. Ji Tirkiye û Ewropayê gelek jin beşdarî panela ku dê di pêşengiya Weqfa Jinên Azad a Navneteweyî (IFWF) de bê lidarxistin bibin.

Konferans, dê ji jinên ku hatine qetilkirin re bê diyarîkirin. Panel piştî axaftina destpêkê ya Seroka Komisyona Wekheviya Navzayendan a IFWF û Mafên Jinan a Parlamentoya Ewropayê Eva Brittt Sevensson dest pê kir û dê bi gelek mijaran panel bidomin.

Di konferansa jinan de dê pêşiyê mijara 'Bandorên sosyolojîk, psîkolojîk, fizîkî û travmatîk' bê nîqaşkirin. Dê moderatoriya vê panelê jî ji 'Koma Xebatê ya li Dijî Kuştinên Namûsê' Maria Hagberg bike.

Wisa tê plankirin ku paşê jî di mijara 'Pênaseya Namûsê: pergala ataerkîl, polîtîka û ol' de nivîkara misirî ya navdar Nawal El Sadawî dê axaftinekê bike.

Parlamentera DTP'î ya Wanê Fatma Kurtulan û parlamentera Partiya Keskan a Parlamentoya Ewropayê Malika Attou Nebarab jî dê mijara di 'Rêbazên Têkoşîna Alternatîf' de nêrîn û tecrûbeyên xwe vebêjin

***Mijarên Konferansê yên din wiha ne:***

✓ Recm, suneta jinan, şîdeta fizîkî û derûnî, şîdeta dewletê, di têkoşîna li dijî şîdetê de nêrîn û stratejî, herêmên pevçûnan û ewlehiya jinan û metod û hedefên xebatê. **BRUKSEL**

## Daxwaza 'Navenda krîza tecawizê'

Platforma Jinan a Li Hemberî Şîdeta Zayendî, bi armanca ku li seranserî Tirkiyeyê 'Navendên krîza tecawizê' ava bibin pêşnûmeqanûn amade kirin û pêşkêşî hikûmetê kirin.

Platforma Jinan a li hemberî Şîdeta Zayendî bi munasebeta 25'ê Mijdarê Roja Piştevanî û Têkoşîna li Hemberî Şîdeta li Dijî Jinê ya Navneteweyî, bi armanca ku li her dera Tirkiyeyê Navenda Krîza Tecawizê ava bikin pêşnûmeqanûnê amade kirin û pêşkêşî hikûmetê kirin. Di pêşnûmeyê de hate destnîşankirin ku jinên tûşî şîdet û tecawizê dibin derî bi derî digerin û mexdûriyeta wan zêde dibe. Di berdewamiya pêşnûmeyê de wiha tê gotin: "Ji ber vê yekê em dixwazin 'Serokatiya Têkoşîna li Hemberî Zayendî' ava bibe."

Platformê ev pêşnûme pêşkêşî wezîrên dewletê Egemen Bagiş, Selma Aliye Kavaf, parlamenterê AKP'ê Guldal Akşît û parlamenterên muxalefetê kir. **ENQERE (ANF)**

## 'Em ê bi zîhniyeta klasîk re têbikoşin'

Di rojên borî de Hewldana Partiya Sosyalîst a Bindestan avakirina xwe îlan kir. Her wiha ji bo ku têkoşîna azadiya jinê bilind bibe biryara vekirinên 'Meclîsên Sosyalîst ên Jinan' jî girtin. Li ser vê armancê girêdayî rêxistina partiyê Meclîsên Jinan ên Sosyalîst tên avakirin. Berdevka Demî ya Meclîsa Jinên Sosyalîst Mukaddes Erdogdu Çelîk ku di heman demê de nivîskar e jî diyar kir ku dê bi zîhniyeta mêran a klasîk re têbikoşin.

Mukaddes Erdogdu ji ANF'ê re axivî û diyar kir ku baskên jinan êdî ji bo wan zêde tiştekî îfade nake û wiha got: "Li jin û xebatên jinan tenê parçeyek e. Ev gelek qels e. Ji bo îrade û kolektîfa jinan derkeve holê tenê baskên jinan ên partiyan ne bes in. Me ev fikr û ev pratîk derxist holê. Nivî meclîsên partiyan dê rêxistina jinê temsîl bike. Bi vî awayî dê nêvî qadên siyasî ji jinan pêk bê."

Erdogdu bal kişand ser rêxistinbûyîna partiyê û diyar kir ku li her derê dê meclîsa jinê bi partiyê re xebatên xwe bimeşîne. Erdogdu wiha dirêjî da axaftina xwe: "Meclîsên partiyê dê ji jin û mêran pêk bê û her wiha ligel vê dê meclîsên sosyalîst ên jinan hebin. Ji bo ku jin bi awayekî aktîf di polîtîkayên partiyê de bi îrada xwe tevli bibin divê ewil rojevên xwe nîqaş bikin. Biryarên ku ji aliyê meclîsa partiyê ve tên girtin divê piştre dîsa ji aliyê meclîsa jinan ve bên nîqaşkirin."

Erdogdu da zanîn ku hemû jinên partiyên din dikarin tevli Meclîsên Sosyalîst ên Jinan bibin û wiha pê de çû: "Ji bo tevlibûnê endamtiya partiyê ne şert e. Yanî jinên ku ne endamên partiyê ne dikarin tevli meclîsê bibin. Hemû jinên ku dixwazin bi vê zîhniyeta paşverû re têbikoşin dikarin tevli me bibin û bibin endamên meclîsê. Endamên meclîsê jî di serî de dê bibin xwediyê mafê hilbijartinê û dê hemû mafên din ji bo jinê bê dayîn."

Erdogdu destnîşan kir ku ji bo xwe pratîka tevgera jinên kurd û rêxistinbûyîna wan mînak digirin û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Bê guman modela rêxistinbûyîna wan gelek fireh e û tenê ji meclîsê pêk nayê. Rêxistina wan a partî û artêşê jî heye." **STENBOL (ANF)**



## 'Em ê li dijî şîdetê rabin'

Platforma Jinan a Enqereyê di çarçoveya şahiyên 25'ê Mijdarê Roja Piştevanî û Têkoşîna li Hemberî Şîdeta li Dijî Jinê ya Navneteweyî de starnd vekirin. Stand dê heta 25'ê mijdarê vekirî be. Endamên Platforma jinan diyar kirin ku dê zîhniyeta serdest ya zilam deşîfre bikin û dê dirûşma 'Hêza me piştevanî û hedefa me jî azadiye' roja 25'ê mijdarê dengê xwe bilind bikin.

Platforma Jinan a Enqereyê di çarçoveya şahiya 25'ê mijdarê de li cadeya Yukselê stand vekirin û her wiha daxuyaniyek dan çapemeniyê. Jinan pankarta 'Ji bo şîdeta li hemberî jinên tên cem hev û ber bi 25'ê mijdarê ve dimeşin' vekirin. Ligel vê di daxuyaniyê de bênavber dirûşmên cur bi cur hatin berzkirin. Jinan di daxuyaniyê de wêneyên jinên ku ji ber şîdetê jiyana xwe dest dane û yê Ceylan Onkolê jî derxistin.

Li ser navê platformê Sati Çali Buruncu axivî û wiha got: "Em ê li dijî şîdeta li hemberî jinê tê meşandin dê her tim têbikoşin û em ê şîdetê şermezar bikin. Ji bo danişîna jinên KESK'î me li her dera Enqereyê afîş daliqandin. Em ê heta 25'ê mijdarê li vir bin." **ENQERE (DÎHA)**

## 'Em di lehê jinê de biryaran distînin'

Şaredarê Yenîşehîrê Selîm Kurbanoglu, diyar kir ku ew di Peymana Kar a Komî (TÎS) de biryarên di lehê jinê de distînin û EPÎDEM ji bo piştgiriya derûniya jinê têdikoşe.

Şeradarê Navçeya Yenîşehîrê ya Amedê Selîm Kurbanoglu, têkildarî 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna li dijî Şîdeta li Hemberî Jinê ya Navneteweyî daxuyanî da çapemeniyê. Di daxuyaniyê de Endamên Meclîsa Şaredariyê û Meclîsa Jinê ya Şaredariyê amade bûn. Daxuyanî ji aliyê Şaredarê Yenîşehîrê Selîm Kurbanoglu ve hate xwendin. Kurbanoglu, anî ziman ku jin ne tenê li malê, li hemû qadên jiyanê rastî êrîşê tên. Kurbanoglu, destnîşan kir ku di encama şer û pevçûnê de herî zêde jin bandoreke neyînî dibînin û wiha got: "Jin wekî eşya têne dîtin. Herî zêde ew ji şer û pevçûnê bandoreke neyînî digirin."

### 308 jinan serî lê dan

Kurbanoglu, anî ziman ku ew di Peymana Kar a Komî (TÎS) de di lehê jinê de biryaran distînin û wiha got: "Yekîneya jinê EPÎDEM, li dijî êrîş û şîdeta jinê piştgiriya derûnî dide. Ji serê sala 2009'an heta niha 308 jinan serî li EPÎDEM'ê dane.

Em hemû ferasetê jinê kêm dixin û neheqiyê li jinê dikin tevan şermezar dikin û qebûl nakin." **AMED (DÎHA)**



*Şaredarê Yenîşehîrê Selîm Kurbanoglu bi boneya Roja Têkoşîna Li Hemberî Şîdeta Jinê li ber avahiya şaredariyê daxuyaniyek da çapemeniyê.*

## Bo 25'ê mijdarê belavok

Endamên Platforma Jinan a Edeneyê bi wesîleya 25'ê Mijdarê, Roja Têkoşîna li Hemberî Şîdeta Jinê ya Navnetewî li bajar belavok belav kirin. Jinan bang li hemû jinan kir û gotin ku bila tevli bernameyan bibin. Li Edeneyê jin li ber Parqa Înonu hatin cem hev. Jinan bênavber dirûşmên wekî 'Em goristanan naxwazin, stargehê dixwazin' berz kirin. Li ser navê platformê Ozlem Yalçinkaya axivî û anî ziman ku dê li hemberî şîdeta li ser jinê dakevin kolanan û têkoşîna me her tim bidome. **EDENE**

## Li Îzmîrê 2 jin hatin kuştin

Li navçeya Karabaglara Îzmîrê du jin li mala xwe mirî hatin dîtin. Her du jin jî bi guleyan hatin kuştin.

Li gorî agahiyên ku hatine bidestxistin li navçeya Karabaglara Îzmîrê li kolana 4717 li malekê du cesedên jinan hatine dîtin. Polîsan diyar kir ku li ser îxbatekê hatine cihê bûyerê. Jina bi navê Turkan Akbaba (49) û Ayfer Memîşoglu (49) ji serê xwe hatibûn gulebarankirin. Her du cesed jî rakirin morgê. **ÎZMÎR**

www.arsivakurdi.org

# Serdest tehamulî zimanê gel nakin

Çetin ALTUN- Rizoyê XERZÎ-AMED

Rojnamevanê rojnameya BERRIA ya baskî Urtzi Urrutikoetxea yek ji rojnamevanan e ku gelek caran serdana gelek bajarên her çar aliyên Kurdistanê kiriye. Rojnameger Urtzi Urrutikoetxea ku demek berê çûbû çiyayên Kurdistanê û bi rayedarên PKK'ê re hevpeyvîn pêk anîbûn, li ser rewşa çapemeniya kurd û ya baskî û çavdêriyên xwe yên Qendîlê sohbetek bi rojnamevanan re pêk anî.

Heta niha gelek rojnamegerên navnetewî ji bo hevpeyvîn û çavdêriyên xwe berê xwe dan çiyayê Qendîlê û bi PKK'iyan re hevpeyvîn pêk anîn û di çapemeniyê de bi berfirehî cih dan gotinên nûner û gerîlayên PKK'ê. Her wiha ev nûçe gelek caran bûbû mijara çapameniya navneteweyî.

Rojnameger Urrutikoetxea li ser rewşa çapemeniya kurd û ya baskî rawestiya û gelek xalên hevbeş yên zor û zehmetiya karê çapemeniyê yê her du gelan kir. Çiqas ev her du gel ji hev dûr bin jî gelek zehmetî û zordestiya ku li wan dibe di gelek xalan de mîna hev in û her du gelan jî ji bo azadiya xwe bi salan li ber xwe da.

**'Tevgera Kurd ragihînim gelê xwe'**

Rojnameger Urrutikoetxea li ser armanca xwe ya çûyîna çiyayên Qendîlê ev tişt gotin: "Armanca min ji çûna Qendîlê ew bû ku min wekî rojnamevanekî baskî xwest ku bi xwe biçim wan çiyayan bibînim û hevdîtinê bi hin rayedarên PKK'ê re bikim. Armanca min ew bû ku bibim wekî pirekê di navbera gelê kurd û yê baskî de û ez wan çavdêriyên xwe û rewşa heyî ya tevgera kurd ji gelê xwe re bighînim. Ji ber di çapemeniya fermî ya dewletan de gelek tiştên çewt an jî gelekî kêm li ser kurdan tên gotin. Lewre jî min xwest ku ez bi xwe biçim ji çavkaniya vê tevgerê nêrînên wan bigirim û rastiya wê bigihînim gelê xwe."

Rojnamgerê baskî bilêv kir ku xwestiye bigihêje kûrahiya çiyayên Kurdistanê û jiyana gerîlayên kurd bi her awayî bişopîne lê derfetên wîn tunebûn û Urrutikoetxea wiha axivî: "Bi rastî min dixwest ku ez bikaribim bigihêm kûrahiya wan çiyayan û jiyana gerîla bi her awayê xwe bişopînim lê ew derfet tunebû min ancax dikarîbû li herêmekê nêz bi çend berpirsiyarên tevgerê re hin hevdîtinan bikim. Li gorî çavdêriya min jiyana gerîla jiyaneke zor û zehmet e û di wî warî de wekî hemû aliyên din ên jiyanê para herî giran jî dîsa li ser milê jina kurd e."

**Zext li ser çapemeniyê heye**

Dema me behsa cezayê girtinê yê Rojnameya Azadiya Welat kir, me dît ku rewşa çapemeniya wan ji hin aliyan ve dişibe rewşa çapemeniya kurd.

Wekî mînak Rojnameya baskiyan ya yekemîn ku bi zimanê baskî weşan kir rojnameya Egukaria bû ku di sala 1990'ê de dest bi weşanê kiriye û heta 2003'an berdewam kiriye lê ji aliyê hikûmeta Ispanyayê ve hate girtin û gelek xebatkarên wan rastî cezayê girtinê hatin û hin xebatkarên rojnameyê hê jî girtî ne.



Rojnamevanê baskî, Urtzi Urrutikoetxea: Dema ku em bi giştî li rewşa çapemeniya Ispanyayê dinêrin wekî hemû welatên din ên Ewropayê ye lê dema ku bi zimanê baskî be rewş tê guhertin û zext zêde dibin

Piştî girtina rojnameya Egukaria di sala 2003'ê de rojnameya bi navê BERRI dest bi weşanê dike lê ew jî dîsa rastî zextan tê û bi sedemên cuda doz lê tên vekirin.

Her wiha piştî çend rojan edîtorê rojnameyê Martexelo Otamendi tevî 5 xebatkarên din ên rojnameyê ji ber doza ku li wan hatiye vekirin derdikevin pêşberî dadgehê.

Behaneya dozvekirina li edîtorê rojnameyê Martexelo Otamendi û hevalên wî jî wiha tê gotin ku xwedî û berpirsyarê nivîsan ê rojnameyê ji alî rêxistina ETA'yê ve hatiye pêwîrdarkirin.

**Rojnamegeriya kurdî karekî pîroz e**

Urtzi Urrutikoetxea ku gelek caran li Kurdistanê rojnamegerî kiriye der barê çapemeniya kurd de ev tişt gotin: "Di xalan de reng û rêbazên astengî û êrîşên li ser çapemeniya kurdî û ya baskî weke hev tên xuyakirin lê rewşa çapemeniya kurdî di bin şert û mercên pir girantir de tê meşandin. Ez di serdanê xwe de ji ber ku min di der barê Azadiya Welat de gelek hevdîtin û agahî girtine lewra jî ez baş dizanim ku xebatkarên çapemeniya kurdî di bin gelek şert û mercên pir giran de rojnameya xwe diweşînin, bi rastî tevî hemû şert û mercên giran ew dikarin rojnameyeke wiha giring biweşînin û belav bikin. Ez karê rojnamegerên kurd gelekî pîroz dibînim."

Urrutikoetxea anî ziman ku ji bilî hin xalên ku rewşa bask û kurdan tê de weke hev tê xuyakirin di hin xalan jî cudahiyeke mezin heye û wiha pê de çû: "Wekî mînak li Ispanyayê rewşa çapemeniyê bi giştî mîna rewşa çapemeniya hemû welatên din ên Ewropayê ye. Lê ev rewş tenê ji bo zimanê baskî tê guhertin, çapemeniya ku weşana xwe bi zimanê baskî dike rastî gelek astengiyan tê." Urtzi Urrutikoetxea di berdewama axaftina xwe de ev tişt gotin: "Tevî vê rewşa giran a rojnamevanên kurd ku ez dibînim û his dikim jî, dema ku ji derdorê dipirsim û behsa rewşa berê dikin, li gor wan rewşa niha û zehmetiyên ku tê de dijîn gelekî kêmtir e ji salên berê lê hê jî gelek zext û astengî li pêşiya azadiya fikr û ramanê heye û her dem bi behaneya propagandaya terorê van astengiyan li pêşiya çapemeniya ne girêdayî hikûmet û bi taybetî ya kurd derdixin pêş."






# Zarok bi zimanê dê û bavê xwe gixînî dikin

HAYDAR DILJEN

Li gor lêkolîneke nû*, zarokên gelek biçûk ne bes dikarin dengê dê û bavê xwe ji hev veqetînin, her wiha ew bi zimanê xwe yê zikmakî gixînî jî dikin. Lêkolîneke nû nîşan dide ku qîjîna zarok ya herî pêşî, ji aliyê wî zimanê ku dema zarok hîn di zikê diya xwe de bûye bihîstiye forma xwe digire. Lêkolînerên ku li Almanya û Fransayê gixînî, qîjîn û giriyê zarokan dane ber hev gihîştine vê encamê. Di navbera vê encamê û zanyariyên ku heta niha di vî warî de dihatin zanîn de cawaziyên girîng hene. Heta niha dihat zanîn ku zimanê zarokên nûzayî ango bebekan zimanekî navneteweyî ye, lê ev lêkolîn vê yekê pûç dike.

Lêkolînên berê nîşan dabûn ku zarokekî/a di zikê diya xwe de 7-9 mehî, dengên ku ji der ve tên dibihîze, bi taybetî ku ev deng wek muzîk ya jî axaftin bi melodî bin. Ji berê de tê zanîn ku zarok hîn di zikê diya xwe de ne dengê dê û bavê xwe nas dikin. Û her wiha ew di vê demê de fêm dikin ka kesên ku dipeyivin kêfxweş yan jî qeherî ne, ango esebî ne. Lê mirov nizanibû ku zarok hîn di zikê diya xwe de ne dikarin zimên teqlîd jî bikin.

> Lêkolîneke nû nîşan dide ku qîjîna zarok ya herî pêşî, ji aliyê wî zimanê ku dema zarok hîn di zikê diya xwe de bûye bihîstiye forma xwe digire

Li Zanîngeha Wurzborgê, tîmeka lêkolîneran di pêşengiya Kathlenn Vermke de qîjîn û gixîniya (gixe-gixa) 60 zarokan qeyd kiriye û paşê anlîz kiriye. Temenê van zarokan ji sê heta pênc rojî bûye. Nîvê van zarokên di malbatên frensîaxêf de hatine dunyayê û nîvê din jî di malbatên almanîaxêv de.

Encamên vê lêkolînê nîşan da ku zarokên frensî bi ahengeka (ton) dirêj ya bilindbûyî qîjiyane, lê yên almanî dema ku qîjiyane ahengeka kin ya nizmbûyî bi kar anîne.

Wermle dibêje, "Ev zanyarî nîşan didin ku qîjîniya zarokên nûzayî (berşîr) bingeha pêşveçûna zimanê wan pêk tîne."Ev lêkolîn dê di hejmara bê ya kovara zanistî ya bi navê "Current Biology" de bê nasandin.

Her wiha ev lêkolîn destekê dide teoriya ku dibêje "ji bo zarokekî/ê dem dikêşe heta ku bikaribe zimanekî bi dest bixe, ji ber ku şertên fizîkî pêk nehatine. Wek mîsal, zarokek dikare di 12 mehiya xwe de dengdaran teqlîd bike, lê berê 12 hefteyan nikare vê yekê bike ji ber ku mercên fizîkî destûrê nadin.

Lêkolîner dibêjin, "Tê texmînkirin ku zarokên nûzayî, bi heweseke mezin tevgerên diya xwe teqlîd dikin ji bo ku bala wê bikşînin ser xwe ku girêdana xwe ya bi wê re bi hêztir bikin."Aliyê melodîk yê axaftina dayikê yekem tişt e ku zarokên nûzayî ji bo teqlîdkirina dayika xwe îkna dike."

Min dema ku encamên vê lêkolînê xwendin, ez carek din li ser rewşa zimanê kurdî fikirîm. Ji bo min jî gelek eşkere bû ku pêvajoya ziman ya xwezayî di zikê dayikê de dest pê dike. Lê tesîra zimanê dayikê ya li ser "ziman"ê gixînŞikirina (xidêxêdi) zarokan ji bo min jî tiştekî nû yû. Ev lêkolîn diyar dike ku her dayik û bavê kurd, ku dixwazin zarokên wan kurdiyeke xwezayî ya baş hîn bibin divê hîn ku zarok nehatiye dunyayê bi hev re û bi derdora xwe re bi îstîkrar bi kurdî biaxifin. Gixîniya zarokan bingeha pêşveçûna zimanê dayikê ava dike û riyên deng jî li gor vê yekê formekê didin xwe û pêş dikevin.

Ez vê havînê li Amedê pêrgî malbateka kurd hatim. Em şevekê bi hev re li parkekê rûniştin û me sohbet kir. Bav, kurdekî kurmanc yê ji Nisêbînê bû. Dayik kurdeka dimilî ya ji Sêwregê bû. Zarokekî wan yê 6 salî hebû. Navê wî Arîn bû. Dema ku zarok bi bavê xwe re dipeyivî bi kurdiyeke gelek paqiş û li gor salên wî dewlemend ya bi devoka Nisêbînê diaxifî/diştexilî, lê dema ku berê xwe dida dayika xwe bi dimilkiyeke gelek baş ya Sêwregê dipeyivî. Te digot qey li Sêwregi di malbateka dimilkîaxêf de jiyaye. Heman zarok, ango Arîn, dema ku ji ba me çû nav zarokên ku di temenê wî de bûn û li koşeyeka parkê dilîstin, me dît ku bi tirkî bi wan re dipeyive. Mixabin li navenda Amedê, ji "zarokên bajarî", yên ku bi hev re bi kurdî diaxifin pir hindik in. Loma Arîn jî neçar bû ku bi wan re bi tirkî biaxife.

Hêjayê gotinê ye ku hem dayik hem jî bavê Arîn zanîngeh xilas kirine. Berî ku bi hev re bizewicin biryar dane ku bi zarokên xwe re bi her du zaravayên kurdî biaxifin. Li ser vê biryara xwe sekinîne û bi ser jî ketine. Mixabin, ji ber sedemên ku tên zanîn, di nav kurdên ronakbîr de nimûneyên weha ne pir in, lê di van salên dawî de pirtir dibin. Mînak Arîn nîşan dide, ku mirov bixwaze, dibe.

Ez li Amedê û hin bajarên Bakurê Kurdistanê yên din jî kesnan nas dikim ku hem dayik hem bav bijîşk, mamoste yan jî xwendineke din ya bilind kirine û bi zarokên xwe re bi kurdî xeber didin. Ev tendens divê xurttir bibe. Gelek lêkolîn û tecrubeyên cîhanê nîşan didin, zimanê ku ji aliyê zarokan ve neyê axaftin û di dibistanan de neyê xwendin pêşeroja wî zimanî tarî ye. Jixwe kurdên ku li taxên li dûra navenda bajaran û li gundan rûdinin bi kurdî diaxifin. Heta mirov dikare bêje ku heta niha barê parastina kurdî li ser pişta wan bû. Divê kurdên bajarî jî êdî xemsariyê di warê zimanê me de li ser xwe bavêjin ku nimûneyên ku min li jorê dan pirtir bin ku zimanê me bibe "zimanê bajariyan" jî.

*Çavkanî :*

*1. Rojnameya Svenska Dagbladet-SVD, 06.11.2009*
*2. Malpera Temaya zimanê zikmakî ya Dayreya giştî ya dibistanan ya Swêdê*
*3. Malpera radyoya zanistî ya Swêdê: www.sr.se*

www.arsivakurd.org

## Sezen Aksu ji bo Ceylan Onkolê stranek çêkir

Sezen Aksu, ji bo Ceylan Onkola 12 salî ku li Licê bi hewana ku ji bargehek leşkerî hatibû avêtin jiyana xwe ji dest dabû stranek nivîsand. Li gorî nûçeya aknewsê Sezen Aksu ji bo Ceylan Onkol stran çêkiriye û beşeke stranê wiha ye; "Li kêleka min a rast ji serî heta binî Mezopotamya, kêleka çepê lawijên Rûmelî diteqin..."

Qetilkirina Ceylan Onkola biçûk rastî bertekan hatibû û li ser navê wê gelek çalakî hatin lidarxistin. Hunermendek wek Sezen Aksu ku, dilê wê bo hemû mirovên cihanê diavêje dikarîbû binivîse. Rewşa herî tund a vê dinyayê gule û bombe, tenê bi Sezen Aksu dikarîbû ewqas bi xemgînî û însanî bihata ziman." **AMED**



# 'Kawayê Hesinkar' li Enqereyê bû

**Lîstika şanoyê ya bi navê Kawayê Hesinkar heta niha li gelek bajaran derketibû pêşberî şanohezan niha jî li Enqereyê beşdarî Mîhrîcana Şanoyê ya Navneteweyî ya Enqereyê bû û rastî eleqeyê hat**

Di çarçoveya 14'emîn Mîhrîcana Şanoyê ya Navneteweyî ya Enqereyê de lîstika reqs şanoyê û koma şanoyê ya Reqsa Mezopotamyayê ku di bin banê Navenda Çanda Mezopotamyayê de xebatên xwe dimeşîne ya bi navê 'Kawayê Hesinkar' hat nîşandan û rastî eleqeyê hat.

Lîstika koma şanoyê ya Reqsa Mezopotamyayê ku di bin banê NÇM'ê de xebatên xwe dimeşînin ya bi navê 'Kawayê Hesinkar' li sahneya Akun a Şanoya Dewletê derket pêşberî şanohezan. Derhêneriya lîstikê Apo Kaya dike û kareografiya lîstikê jî ji aliyê Serhat Kural ve pêk tê. Di lîstika ku muzîka wê ji aliyê Emre Koçabaş ve hatiye amadekirin û dekor ji aliyê Şebnem Yetîm Îdîk ve hatiye amadekirin de hêmayên wekî tirs, îxanet, vîn, berxwedan, azadî û erk bi nêzîkahiyeke cûda tê lêpirsîn.

Serhat Kural anî ziman ku ji ber ku lîstika wan di mîhrîcana şanoyeke navneteweyî de rastî eleqeyê hatiye kêfxweş in. Kural bilêv kir ku çend roj berê li Venedîka Îtalyayê derketine ser dikê û wiha axivî: "Ev lîstik ji bo min lîstikeke girîng e. Ev lîstik destana duyem e ku em derdixin ser dikê. Berê jî li ser navê Navenda Çanda Mezopotamyayê Mem û Zîn lîstibû."

**'Lîstikeke rojevî ye'**

Serhat Kural da zanîn ku mebesta wan ew e ku çand û folklora kurd û wêjeyê bînin cem hev û pêşkêşî temaşevanan bikin û Kural der barê mijarê de ev tişt gotin: "Em dixwazin lîstikên xwe di serî de bigihînin gelê kurd û gelên din. Em bi vê mebestê beşdarî mîhrîcanan dibin. Ji ber vê yekê em beşdarî 14'emîn Mîhrîcana Şanoyê ya Navneteweyî ya Enqereyê bûn."

Şanoger Serhat Kural bilêv kir ku Destana Kawayê Hesinkar a dîrokî hê jî lîsteke rojevî ye û wiha got: "Ger em mînakekê bidin wekî tê zanîn ku ji bo Mazlum Dogan dibêjin Kawayê Hemdem. Lîstika me jî duhî, îro û sibê her tim xwe nû dike. Ev destan di dîroka cîhanê de xwedî cihekî girîng e. Ji ber vê yekê destana Kawayê Hesinkar ji bo me girîng e.



Em di destpêkê de li ser 4-5 lîstikan rawestiyan me di vê lîstikê de biryar da. Em 6-7 mehan li ser vê lîstikê xebitîn û lîstik anî vê merhaleyê."

**Promiyer li Amedê pêk hatibû**

Serhat Kural da zanîn ku promiyera lîstikê di dawiya meha gulanê de li Amedê pêk hatibû û wiha axivî: "Ji bo me eleqenîşandana temaşevanan gelek girîng e û ji ber ku vê jî em kêfxweş in. Em di riya xwe de hêdî hêdî dimeşin. Em ê biçin Bursa û Îzmîrê jî. Em ê li her dera Kurdistanê lîstika xwe bilîzin. Lîstina vê lîstikê ji bo me tiştekî heyecan e. Em ê di riya xwe de bimeşin û armanca xwe her tim bi heval, sazî û temaşevanan re parve bikin." **ENQERE**



# Koma Ferec û Mehmet Atli ciwan coşandin

Di konsera Mehmet Atli û Koma Muzîkê ya Ferec li Wanê dayîn de ciwan bi stranên wan coşiyan û demên xweş derbas kirin.

Komeleya Navenda Çandê ya Mezopotamyayê ya Wanê (MKM-DER) li Stadyuma Bajar a Wanê konser da. Mehmet Atli û Koma Ferec di konserê de derketin ser dikê û muzîka xwe ji gel re pêşkêş kirin. Endamên Koma Çareseriya Demokratîk û Aştiyê jî di nav de zêdeyî 2 hezar kesî beşdarî konserê bûn. Ji ber betalkirina sefera balefirê Îlkay Akkaya û Rojda nekarîn beşdarî konserê bibin. Koma Muzîkê ya Ferec û Mehmet Atli nêzîk 4 saetan ji girseyê re stranên xwe pêşkêş kirin û coşeke mezin afirandin. Di konserê de car car ji bo Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan slogan hatin avêtin. Endamên komên aştiyê ku ji bo guhdariya konserê hatin, rastî eleqeyeke mezin a hemwelatiyan hatin. Li vir endamê komê Nizar Buldan axaftineke kurdî kir û wiha got: "Ku dewlet dixwaze dayik negirîn, rastî jî lazim e ku operasyon di zûtirîn demê de bi dawî bibin." **WAN**

# Li Wêranşarê şahî pêk hat

Li navçeya Wêranşarê ya Rihayê, Navenda Çand û Hunerê ya Rihayê şahiyek li dar xist. Di şevê de Hunermend Seyda Perînçek li ser piyan hate guhdarkirin.



Li Wêranşarê, Navenda Çand û Hûnerê ya Rihayê şahiyek li dar xist. Di şahiya bi dirûşma "Em Aştiya ku Roj bîne bi çandê pêşwazî bikin" pêk hat de Şaredara Wêranşarê Leyla Guven, Serokê Rêxistina DTP'ê yê Navçeya Wêranşarê Adnan Etlî û bi sedan kes amade bûn. Şahiya bi du beşan pêk hatî de di beşa yekê de Koma Şitlên Azadiyê ya NÇM'a Edeneyê derket ser dikê û şahiyê dest pê kir. Piştî komê şagirtên Şanoya Şaredariya Wêranşarê skeçeke kin pêşkêş kir. Di skeçê de mijara şîdeta li ser jinê hate ziman. Piştre jî Hunermenda NÇM'a Mersînê Gulhan derket ser dikê. Herî dawî Hunermend Seyda Perînçek derket ser dikê. Hunermend Perînçek strana Şehîdên Amarayê û yên Hunermendê nemir Aram Tigran gotin û rastî eleqeyeke mezin hat. Di şevê de gelek alên PKK'ê û posterên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan hatin vekirin û dirûşm hatin berzkirin. **RIHA**

# Mexdûrên şerê Başûr piştî salên dirêj fêrî kurdî dibin

Li Herêma Federal a Kurdistanê, 500 mexdûrên şer ên ji başûrê Iraqê koçberî Herêma Kurdistanê bûne, fêrî kurdî têne kirin.

Rêxistina Kêrhatiyê Ciwanan (KYEO), li Herêma Federal a Kurdistanê bi alîkariya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê kursa perwerdeyiya zimanê kurdî vedike. Kurs armanc dike ku kesên ji başûrê Iraqê ji ber rewşên nebaş û şer koçberî Herêma Kurdistanê bûne, fêrî kurdî bike.

Her wiha ji bo 500 mexdûrên şer, kursên kurdî tên dayîn. Merasîma vekirina perwerdeya zimanê kurdî, li Dibistana Enkaweyî ya Nimûneyî ya Bajarê Hewlêrê dest pê kir. Wezîrê Perwerdehiya Herêma Federal a Kurdistanê Sefîn Dizayî, Metran Rebana Qeyîs, Serokê Tîma avakirina Herêma Kurdistanê ya Amerîkayê Endryos No, Waliyê Hewlêrê Newzad Hadî û Endama Dibistana Têkiliyên Derve ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê Felah Mistefa û gelek kes beşdarî merasîmê bûn.

**Hezaran hatine perwerdekirin**

Wezîrê Perwerdehiya Herêma Federal a Kurdistanê Sefîn Dizayî, der barê kursa kurdî de wiha got: "Niha cîhan ber bi pêşketinan ve diçe û lazim e di qada perwerdehiyê de jî her kes xwe pêş bixe." Berpirsiyarê KYEO'yê Şad Mihemed, anî ziman ku nêzî hezaran ciwanî ji projeya wan sûd wergirtiye.




**Alîkariya Amerîkayê**

Serokê tîma avakirina Herêma Kurdistanê ya Amerîkayê Endryos No jî got: "Amerîka bi armanca zêdetir pêşxistina Herêma Kurdistanê, heya niha bi qasî milyarek dolar alîkariya madî daye 3 bajarên Hikûmeta Herêma Kurdistanê.

Her wiha Amerîkayê 161 dibistanên Herêmê ji nû ve careke din nûjen kiriye û gelek alîkariyên din yên di warê perwerdeyî û di warên din de ji bo herêmê pêşkêş kiriye." **HEWLÊR (DÎHA)**

www.arsivakurdi.org

# Qerf Henek









Îkram Balekanî
balekani@hotmail.com

## Şew-ba Be-Razan

Xwedêyo Xwedêyo, tu firsendê nedî dest zaliman. Belê ev beşek ji helbesta Koma Silbûs û Tarî bû ku dayika wan xwendibû û min ji wan dizî. Rast e, divê em duayên xêrê bikin, lê pêwîst e ku em jî rê nedin zaliman. Xwedê emir dike: "Ji te hereket, ji min bereket." Ku em bikevin nava tevgerê wê karê me lê bê. Belê zalim bi her awayî li dora me tên û diçin. Wekî ku ne bes be, îja bi dizî vîrûsan li nava me belav dikin. (Ez bawer im vîrûsa berazan ji 'Kurmê Darê' baştir e.) Ku kurmê darê nebe, dar xuloxe nabe, yanî narize.

Ohooo, min jî pir dirêj kir. Ka ez bême ser mijarê bêmane. Belê carekê bi navê vîrûsa çûkan, êşa mirîşkan, niha jî bi navê vîrûsa "Şewba Berazan" hatin xizmeta me. Heyran ku sibê bêjin êşa çêlekan, qet şaş nebin.

Beraz bi kurmanciya jêrîn (soranî) yanî kesê/tişta xwedî raz. Be-Raz. Yanî 'bi Raz'... "Şewba Berazan" jî bi kurmanciya jorî dibe: "Bayê Şevê yê bi sir û 'Raz'... (Ev fantazî ye, hûn bawer nekin). Îja ji vê gotinê mirov dikare bigihîje vê encamê ku ev vîrûs jixweber nayê. Hin kes çêdikin û belav dikin. Nebêjin çawa û çima.

Heyran ku saziyên dermançêker, dermanên xwe nefiroşin, wê çawa karibin pere qezenc bikin?

Her carê jehrekê çêdikin, paşê jî panjehra wê difiroşin. (Pêşî derd paşê derman).Ax me behsa derd kir, derdê me zêde bû û helbesta Babe Tahirê Hemedanî hate bîra min ku dibêje:

Hin ji derd û hin ji derman hez dikin

Hin ji dîdarê (hevdîtin) û hin ji hesretê hez dikin

Ez ji derd û derman û dîdar û hesretê

Ji wê hez dikim ku "Ew" jê hez dike...

Hûn bawer nakin ku derd çêdikin û derman difiroşin? Normal e ku hûn bawer nekin. Ka bifikirin, ma berazên Kurdistanê çi karê wan heye li Mekzîkayê. Gelo ku mirov neçin ji Mekzîkayê vîrûsan neyînin, vîrûsê çawa bigihîje Kurdistanê? (Îja bû îşê zarokan. Ez ji Hemedanê çûm Mekzîkayê...)

Xwezî me bi zimanê Berazan bizaniya. Sedîsed ew jî niha li dijî vîrûsê xwe derzî dikin. Dibe ku ew jî jê re dibêjin "Şewba Însan".

Ew şirketên derd û derman jî karê xwe baş dikin. Mirovan ditirsînin û paşê wan bi kar tînin. Tirs ketiye nava rewşenbîrên kurd jî.

Wê rojê di înternetê de ez rastî rewşenbîrekî kurd hatim. Min silav da wî, lê bersiv neda. Min kir û nekir, bersiva min neda. Ez fikirîm gelo sedem çi ye. Paşê min got heyran, hema gotinekê bêje ku ez zanibim sedem çi ye tu deng nakî û nanivîsî...

Got, ez ji vîrûsa Berazan ditirsim. Îja min fam kir ku wî tevîhev kiriye. Bihîstiye ku hin kes bi riya e-mailê yan bi riyên din vîrûsan dişînin û camputer û mailên hev xira dikin. Hema gotina vîrûsê bihîstiye, dibêje qey hemû vîrûs nexweşiyê bi xwe re tînin. Ditirse ku li gel min qise bike, qaşo xwe ji vîrûsan diparêze.

Wele ez bi xwe şerm dikim, ji ber ku em bi hatina vîrûsan re însanetî jî çû. Heyran em berê mêvanperwer bûn. Lê niha ku mêvan tên, em xwe vedişêrin. Em naxwazin wan bibinîn, tenê ji bo ku em silavê nedin wan û destê wan negrin, em xwe qul bi qul vedişêrin bêmane. Ma ev jî hal e. Wele mirov ji halê xwe fedî dike. Van bêbavan em ji însanetiyê derxistin. Heyran Ewropa mirov xira dike.

Lê wisa xuya dike ku tu nexweşî bandorê li gelê Kurdistanê neke. Tekane rojeva wan têkoşîna li Kurdistanê ye. Ji ber ku nexweş ku telefon dikin bi bijîşkan re diaxivin, pêşî dibêjin: "Em tecrîda li ser Serok şermizar dikin:" Ev jî nîşan dide ku ne şewba Berazan, ku Beraz bi xwe jî bên, wê nekarin bikevin Kurdistanê. (Made in Osman Baydemir)... (Wê Nedome.)

## Rika kerê û helwesta Bedranê Botî

Li Botan gundekî ku bi rezê xwe dewlemend hebû. Bedran jî yek ji xelkê wî gundî bû. Bedran rojekê 2 selik tirî davêje ser pişta kerê xwe û berê xwe dide Amedê. Dema gihîşt Amedê rasterast berê xwe dide bazarê û tiriyê xwe dide ber firotanê. Piştî ku tiriyê xwe difiroşe di aliyê deriyê çiyê re derbas dibe û bi pereyên tiriyê xwe tedarikên malê kirîbûn.

Piştî ku lazimiyên xwe kirîne barê xwe dîsa avête ser pişta kerê xwe û berê xwe daye ber bi deriyê Mêrdînê ve. Dema gihaye ber deriyê qereqolê kerê wî li wir mexel hatiye û nema dimeşe. Li ser vê rika kerê Bedran aciz dibe û çend daran li kerê dide. Ker dest bi zirînê dike, li ser zirîna kerê polîsên qereqolê jî derdikevin û sedemê zirîna kerê ji Bedran dipirsin. Lê dikin û nakin ji hev fam nakin, li ser wê yekê dukandarên wê derê tên navbênkariyê dikin lê mixabin polîs hemû bar û pereyên bedran desteser dikin û wî zelût dişînin malê.

Dîsa bedran bi qurban û heyran li ber kerê digere lê girê kerê û rika wê derbas nabe. Dîsa bedran radihêje darê xwe û dikeve ser kerê têra wê lê dide. Dema dighîjin ber qereqolê dîsa rika kera wî tê û mexel dikeve li wir jî lê dide ker jî dîsa dizire û polîs tên ba wan.

- Bu eşek niye zirliyor, bedran bersivê dide polîsan û dibêje : Wele polîs beg ez dikim nakim jê re dibêje kuro turkçe zerla ew dîsa kurtçe zirliyor.



Polîs dibêje kuro tu henekê xwe bi me dikî û dest bi lêdana Bedran dikin.

- Lê her Bedran dibêje: wele min jê re got tukçe zirla lê kerekî bi rike. Polîs dibetilin ji lêdana wî û mecbûr dibin wî berdidin. Berdran bi hevsarê kera xwe digire û dikeve riya gundê xwe de.

Piştî ku pira deh derî derbas dikin, bedran xencera xwe derdixe û her ku yekê lê dide ji kerê dibêje, naxwe ew polîs pismamê te bûn ku li ser te qebûl nekirin û te hişt ku ew qasî li min bidin, dikeve ser kerê, kera xwe dikuje û dibêje :de bila êdî pismamên te werin li ser te qebûl nekin.

- Dema ku bedran nêzî gundê xwe dibe, kekê wî tê pêşiya wî û jê dipirse te xêre bira ka kera te, tu çima peya vegeriyayî.


- Qet nebêje kekê min, li bajêr çend pismamê kera me derketin, min li kerê da û wan jî hatin li min dan.

- Kekê Bedran dibêje: wele min zanibû ew ker kurê kerê xayine, par dema bavo mir jî wî kerê xayin hacetê xwe derxistibû û li bin zikê xwe dida, min ji wê gavê ve zanibû ku ew kerekî xayine.

Wekî hûn tev dizanin dîroka qedexeya li ser zimanê kurdî gelekî dûr û dirêje û bi gelek awayan hatiye gotin. Gelek serpêhatiyên vê qedexekirinê hene û hê jî bi gelek rengên cuda ev qedexe û bêtehemiliya zimanê kurdî berdewam dike lê ji aliyekî din ve jî parêzvanên ziman jî hene û ew jî bi her awayî û di bin hemû şert û mercan de zimanê xwe parastine heta roja îro.

*Danhev: Paşa Demir*

## XAÇEPIRS



### Ji çepê ber bi rastê ve

**1.** Kurteya elementa Aktînyûmê... Peyva neyînî... Qumaşê ku ji hiriyê çêdibe **2.** Jina ku pez didoşe **3.** Ava qirêj a piştî şûştinê... Paytexta Perûyê **4.** Bi rûsî erê... Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe Hûd ji hêla Yezdan ve hatiye tunekirin **5.** Kar û xebat... Otêlên lûks an jî avahiyên wurşedar **6.** Ji bo firehî, dirêjî û kûrahiya tiştekî **7.** Kesê ku di karekî de xwedî rayeya fermankirinê ye... Têbinî
**8.** Notayek... Xweliya piştî şewatê... Cejn, eyd
**9.** Baneşana bêhntengiyê... Aşît, şepe, berfende

### Ji jorê ber bi jêrê ve

**1.** Celebek qaxizê nivîsê ku qalind e û rengê wî dişibe rengê kayê... Darê ku kesên mîna hikumdar, mirovên dînî ku wekî sembola hêzê bi kar tînin **2.** Kûzê avê... Rojek **3.** Sir, tiştê her kes pê nizane... Jin an jî mêrê ku hevsera/ê wî/wê miriye **4.** Ji bo dem û zeman, nîveka destpêk û qedanê... Kurteîmzeya ku tenê bi tîpa destpêkê tê kirin **5.** Vexwarina sereke... Edalet
**6.** Helale, lale... Dar an jî hesinê ku didine ser stûyê ga ku pê erebe dikişandin an jî cot dikirin
**7.** Cephe, bere... Teref **8.** Alava ku pê hespan tîmar dikin... Rengek
**9.** Serbest, ne kole... Şerm

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | M | A | R | M | I | J | ■ | T | E |
| 2 | A | L | A | ■ | N | ■ | T | O | L |
| 3 | S | Î | ■ | Î | C | A | R | ■ | E |
| 4 | T | ■ | O | ■ | Î | Ş | ■ | Î | Z |
| 5 | ■ | A | D | I | L | ■ | E | N | Î |
| 6 | X | W | E | ■ | ■ | A | C | ■ | Z |
| 7 | A | A | ■ | M | A | D | E | K | ■ |
| 8 | N | ■ | K | E | J | ■ | M | I | R |
| 9 | Î | C | A | D | ■ | N | Î | Ş | E |








## Hemreza min

*Demê qut kir laçika veqetîna*
*me*
*Bê oxir xwestin*
*Meqes kir cewê demê*
*Ne seremoniyeke*
*xatirxwestinê*
*Ne jî awirekî yarê*
*Ku birijîne çend rondikên çav*
*Ne jî hembêzkirineke bi keser*
*Û piştre bihejîne destekî*
*nasyar*
*Wext giran bû*
*Rûxiyabû ser min*
*Wek kabûsên şevên giran*

*Çavê min geriya derdor*
*Li nav derîzanga demê*
*Qadên ser û ber*
*Çûyinên bênavber*
*Li pey nêrînên guhnedan*
*Tenê sîluetê te ma diyarî*
*Di çavên min de*
*Yek jî wêneyên nîvmayîn*
*Kenîna te*
*Bibexşîne hemraza min*
*Bibexşîne  hestiyar û dildara*
*min*
*Bibexşîne kulîlka siruşta min*

*Niha dizivirînim çerxa demê*
*Û ber bi te ve diherikim*
*Ji kunreşa daqulter*
*Bêhna evîna te dikişîne*
*Bêhna dilê min*
*Di bin kurtirîna avis a*
*okyanûsan*
*Kurtirîn*
*Pêlên livandina te nîşan dide*
*Keskesora bêriyê*
*Amade bike ayîna gihîştinê*
*Parêzgeha tenha û ker*
*Ya hembêzkirina bê dawî.....*

RAHMÎ BALDAK

# Kuştina helbestvanekî

POLAT CAN

Hemû kêlî di rojnameya min de dimirin Navê min ji bîra min diçû û mejî difirî û hew li hêlîna xwe vedigerî...

Bilûra min lal bûbû û awaz di laltiya kûr de fetisî bûn...

Ez nizanim çima wê dema bê dem û di wê cihê bê cih de hemû rûbar çikiyabûn...

Ezman hemû hatibûn xwarê, ji şeş ezmanan tişt nemabû, te digot qey stûna pişta wî şikestiye...

Ew cara yekem bû  ku her çar alî şaş bûbûn, êdî ne rojhilat û ne bakur û ne jî jêr-jor mabûn.

Li şûna pelên daran kurm û kêzik dixilxilîn, êdî ew bûbûn desthilatdarên gerdûna nemayî.

Her sermayên zivistanê me bi hesreta germahiya havînê û her germahiya tebaxê jî bi bêrîkirina serma çile derbas dikirin... Lê êdî ne çile, ne tebax û ne jî demsal mane di ferhenga me de.

Çirqeçirq ji dilê min dihat, li şûna xwînê aveke zer di damarên laşê min ê zuha de belav dikir...

Li ser çi rûyî nîşaneyên zindîbûnê nemabûn, çav ji şûna xwe derketibûn û di kuna wan de mar zimanên xwe yên çetel derdixistin û dikeniyan...

Hema bi ku de diçûm li wir bextreşiyekê hembêza xwe ji min re vekiribû û digot: “Bi xêr hatî”! bi ser min de zinar dihatin xwarê, agir ji nava keviran derdiket û dawa kirasê min dişewitand, ez ji kendalan diketim xwarê, hestiyên min parçe dibûn, serê min ji laş dûr diket û laş li pey serî direviya...

Dayika min her digot ji min re “dema xwedê kevirekî li mirov dixînê, kevirekî din jî bi ser de digire...” Lê dayê ev kevirên xwedê wê çi demê biqedin? Dayika min jî lal dibû, porê wê spî dibû, diran hemû diweriyan, rûçikê wê diqermiçî û çavên wê kûjul dibûn, pişta wê xûz dibû û di nava axê de diçû û hew dixuya... Dayê, dayê! Bersiv nîn e û dîsa agir bi hemû deran dikeve...

Mar ji çavên wan derdikevin, bi zimanê xwe yê çetel rûyê min yê bê çav dialastin, li dora zengelorka min xwe dialandin û xwe diguvaştin... Hinase li min dibirîn, hinavên min tijî ba dibûn, mezin dibûn, diwerimîn û ji nişka ve diteqiyan...

Êş tûne bû... Girî û qîrîn tune bûn. Lê dil û hinavên min hemû li ber min rijiyabûn, li şûna xwînê jî, ava zer ya ku bêhna binketinan jê dihat dirijiya, dirijiya û di newal û cokên avê de diherikî û hemû cîhan di bin xwe de dixeniqand...

Çavên wî lê diket, mada wî li hev diket û vedireşiya... vereşandina wî hemû kurm, kêzik û dûpişk bûn. Mar kurê maran! Ma dûpişkên ku te xwarine ne besî te ne, ma zikê te yê qetiyayî wek dahola gewendeyan têr nabe? Em ê hemû defterên te bişewitînin û pênûsa te bavêjin kuna mar û hovên çolê. Êdî tu yê hew helbestan binivîsî û hew çîrokan bihonî. Ku tu bixwazî helbestvanekî bikujî, destpêkê pirtûk û defterên wî bikuje, jixwe wê ew bixwe bimire!

Gawirên lawên gawiran, hemû defter, pirtûkên nîvcomayî li laşê min pêçandin û agir pêxistin… Bêhna goştê biraştî difna min kul dikir; bêhn gişte erşa Yezdanê rûtirş, melekên ji kuştinê hez dikin, li dora min wek koza mêşan civiyan û hêdî hêdî rûpelên pirtûkên min bûn xubar û bi donê min re heliyan çûn bin axa zer û zuha…

Di wê kêliyê de ji xew veciniqî û dît ku xewna şevan bû her tişt… Reviyam pirtûk û defterên xwe, hîn li cihê xwe bûn… Û hîn jî li cihê xwe, nîvco mane.

# Beq û Şivan*

Çi hebûye çi tunebûye. Li gundekî şivanek hebûye. Wî her sibê li berbangê, pezê xwe dibir çêrandine û li dora nîvro jî, li hêla çemekî av dida û mexel dikir.

Rojekê dîsa şivên pezê xwe li hêla çem mexel kiriye û bi bilûra xwe jî ji kilamên dila lêxistiye.

De tu were, ji çem beqbeqek derdikeve û li ser zinarekî disekine. Beqbeqek çav sor û belek. Bi dengê bilûrê ve kiriye qurequr û serê xwe hejandiye. Şivan di bin çavên xwe re ew beq dîtiye û qet hisa xwe nekiriye. Dengê beqê û bilûre wekî meqamekî dibe û ew deng li hevdu tên.

We ew beq û ew şivana bidîta, we yê bigota, ew qey hevalê hev ên berê ne...

Şivan diweste. Dest ji bilûra xwe berdide. Beq jî di cî de baz dide avê û ji ber çavên şivan com dibe. Şivan hema fêm dike ku ew beqa bi dengê bilûrê ji avê derdikev e. Şivan dîsa dest bi bilûra xwe dike û kilameke dilan dixe. Beqa çavsor û belek ji avê derdikeve û xwe dide ser zinêr û dike qurequr û bi dengê bilûrê serê xwe dîsa dihejîne.

Beq li çavên şivan mêze dike, paşê ji ser sînga şivan baz dide û xwe davêje avê û careke din jî ji avê dernakeve. Şivan bi girî li paş xwe qet mêze nake

Roj, meh derbas dibin. Şivan her ku li bilûra xwe dixist, ew beq jî ji avê derdiket û bi dengê bilûre ve dikire qurequr û serê xwe dihejand.

Şivan ji beqê hez kir. Wî ji beqê re her roj bi bilûre kilamên dila lêdixist. Beqê jî ji wî hez kir. Carna li ser zinêr baz dida û dihat li ser çokên şivan disekinî. Carna şivan ew beq dida ser destê xwe û bi tiliyên xwe serê wê mist dida. Carna jî şivan li ser piştê, li ser çêrê xwe dirêj dikir û beq dihat li ser sînga wî rûdinişt û li çavên hev mêze dikirin.

Edî wan dilekî xwe xemgîn di nav hev de girtibû.

Ev dil, qet ne kevçiyek şîr û bulxur e ku em fêm bikin…

Şivan her roj bi bilûre derd û kulên xwe ji beqê re digot.

Digot;

Beqê beqê beq velistiye
di dilê min de ar vêxistiye
baz 'de were cem min
Min çavên te ramûsiye

Beq bi wê kilamê re ji avê derdiket û xwe dida ser sîngê şivan û li çavên hew mêze dikirin. Wî yê ji beqê re qala dilan bikira. Ji wê re kilama Eman Elo, Fat Qilotê û Efê bistira. Ji wê re ziravê Qamişê qul lêxista û qala dilê keç û xortan dikirin.

Roj û meh derbas dibin. Şivan rojekê difikire û dibêje; "Wa dilî ar û pêtî pê ketî weng nabe." Dibêje; "Eva dil ne di şûnê de ye."

Şivan biryara xwe dide û diçe hêla çem û li bilûra xwe dixe. Beq ji avê derdive û tê xwe dide ser sîngê şivan. Şivan li beqê xulî (hêrs) dibe û dibêje; "Here com bibe. Me xwe bi wî dilî kuşt. Êdî bes e, ji ber çavên min here."

Beq li çavên şivan mêze dike, paşê ji ser sînga şivan baz dide û xwe davêje avê û careke din jî ji avê dernakeve. Şivan bi girî li paş xwe qet mêze nake û ji çavan dûr dikeve.

Roj û meh derbas dibin. Şivan dest ji pez çêrandinê berdide. Deh salan dest ji şivantiya xwe berdaye û destên xwe ji nan û ji avê dûr dixe. Di dilê wî de êdî arek vêdikeve. Her roj ew ar pêtî dide û şivan bi wî arî dişewite.

Rojekê şivan dîsa tê hêla çem. Bi dilekî şa bilûra xwe derdixe û ji beqê re li kilamên dila dixe.

Dibêje:

Beqê beqê beq velistiye
di dilê min de ar vêxistiye
Baz 'de were cem min,
Min çavên te ramûsiye

Lê beq ji avê dernekeve. Mîna berê di cî de baznade nayê ser zînar. Şivan sekinî û qet tiştek fêm nekin. Dibêje: "Qey dengê bilûra min wê nebihîst?" Careke din ji beqê re li bilûra xwe dixe. Şivan çavên xwe berdide avê lê beqa çavsor û belek ji avê dernakeve. Şivan ditirse. Ar û pêtî bi dilê wî dikeve. Radibe ser xwe û hinekî din nêzikî avê dibe. Ji beqa xwe re careke din li bilûra xwe dixe. Lê beq ji avê dernakeve.

Dib şev. Heyv dide ser avê û stêrk jî xwe didin dora wê. Şivan jî hîn li hêla çem rûniştî ye, ji bilûrê kilama beqê û ji çavên şivan jî hêsir dilop dikin.

Di ser dilê beqê û şivan de pir sal derbas dibin. Li şûna wan keç û xort dicivin. Ew tên ser çem û dibêjin;

"Beqê beqê beq velistiye
di dile min de ar vêxistiye
Baz 'de were cem min
Min çavên te ramûsiye"

*gelêrî

www.arsivakurd.org

# ROJEV

24 Mijdar 2009 Hejmar: 12 Sal: 1 E-mail: awelat2002@yahoo.com




# Pîrê û kalo neçar in debara 10 nifûsî bikin

**Hevserên pîr û kal ên bi navê Haci (93) û Nazlî Yetîşkîn 20 sal berê ku ji ber neçariyê ji herêmê koçî Mêrsînê kir di bin şert û mercên zehmet de jiyana xwe didomînin. Pîr û kal ji bo debara xwe bikin gêzikan difiroşin**

Hevserên bi navê Haci (93) û Nazli (77) Yetişkîn ku 20 sal berî niha ji navçeya Besniyê ya Semsûrê ji ber pirsgirêkên aborî koçî Mêrsînê kirin, hêj jî ji pirsgirêkên xwe yên aborî xilas nebûne. Hevserên pîr û kal neçar in bi firotina gêzikan debara 10 nifûsî bikin.

Hevserên bi navên Haci (93) û Nazli (77) Yetişkîn ku 20 sal berî niha ji navçeya Besniyê ya Semsûrê ji ber pirsgirêkên aborî koçî Mêrsînê kirin. Lê malbata Yetişkîn ku li navçeya Akdenîzê bi cih bû, ligel derbasbûna 20 salan jî ji pirsgirêkên aborî xilas nebû. Haci Yetişkîn û Nazli Yetişkîn ku 7 zarokên wan hene 5 zarokên xwe jî zewicandin û tevahiya wan ji malbatê veqetiyan. Hevserên pîr bi 2 zarokên xwe û 6 neviyên xwe re jiyana xwe domandin. Ji ber ku kurê wan ê bavê 2 zarokan û hevsera wî terk kirî, naxebite û hevserê keça wî ya dayika 4 zarokan nayê malê hemû bar maye ser stûyê hevserê pîr û kal. Malbata Yetişkin bi alîkariya derdorê jiyana xwe didomîne.

**'Li kolanan dixebitin'**

Hevserên pîr ku tu hatina wan tune ye û hemû barê malê maye ser stûyê wan, ji bo debara malbatê kuçe bi kuçe digerin û gêzikan (melkîs) difiroşin.



Nazli û Haci Yetîşkin daxuyandin ku ji sibê heta êvarê digerin û ev yek wan pir diwestîne û wiha gotin: "Tu hatina me tune ye. Ewlehiya me ya civakî jî nîn e. Em bi erebeya destan gêzikan difiroşin. Rojê nêzî 10 TL em bi dest dixin." Haci Yetîşkin diyar kir ku dilê wî ditengije û nikare tedawî bibe. Yetîşkin anî ziman ku nikare dermanê xwe jî bikire û xwest xêrxwaz alîkariya wî bikin. Nazli Yetîşkîn jî heman gazinde kirin û xwest ku destê alîkariyê dirêjî wan bê kirin. **MÊRSÎN (DÎHA)**

## Belediye Vansporê Dîskîspor têk bir

Di Lîga 2'emîn a grûba 4'emîn de du tîmên şaredariyên kurd hatin hemberî hev. Belediye Vanspor li deplasmanê li hemberî reqîbê xwe Diyarbakir Belediye Dîskîsporê 1-0 bi ser ket û 3 pûan wergirtin. Gola Vansporê di deqîqeya 41'emîn de Alî Var avêt. Maç bi serkeftina Vansporê bi dawî bû û Wansporê 3 puan girtin.

***Diyarbakir Dîskîspor:*** Bulent, Kerem Can, Mehmet Alî Yakisik, Oktay, Abuzer (Hakîkat dk.62), Ahmet Kurt Alî Yildirim (Caner dk 65), Emrah, Erkan, Fatîh (Mehmet Sirali dk.80), Abdullah Yilmaz

***Teknîkdîrektor:*** Alî Ravci

***Belediye Vanspor:*** Ozcan, Berkan, Turan, Zekî, Murat, Abdullah Temircan, Îlhan Var, Alî Kurt (Yertek dk.78), Erkan Akkoç (Tufan dk.73), Serdar, Ferhat

***Teknîkdîrektor:*** Mehmet Tugrul

***GOL:*** Ilhan Var (dk.41)

Qertên zer: Alî Yildirim, Mehmet Alî Yakisik, Emrah Dursun, Hakikat (DÎSKÎSpor)

***Encamên din yên vê grûbê wiha ne:*** Adana Demîrspor 0 -2 Adiyamanspor, Urfaspor 2-1 Elazîzspor, Îskenderun 1-0 Maraşspor. Maça Meletîspor û Mêrdînê ji ber ku gogbazên Mêrdînê bi şewba berazan ketine betal bû. **AMED**

## Diyarbakirspor nikare ber li têkçûnên xwe bigire

Di hefteya 12'emîn a Lîga Super a Tirkiyeyê de Diyarbakirspor bû mêvanê Kayserîsporê.

Diyarbakirspor bi van gogbazên xwe derkete qadê: Gokhan, Besam Abbas, Tolga, Abdullah (Dk. 70 Ibrahîm ), Tazemeta, Ayman (Dk. 70 Erhan ), Dîallo, Josefh Job, Bariş, Adnan, Celaleddîn.

Ji Diyarbakirsporê Dîallo hêj di deqeya 3'an de qerta zer dît. Dîallo bi qerta zer dilîst û bi destê xwe li gogê xist û hêj di deqeya 32'an de ji maçê hate derxistin.

Dewreya yekemîn 0-0 ma. Kayserîspor bi golê dest bi dewreya duyemîn kir. Di deqeya 48'emîn Makakula gola Kayseriyê tomar kir. Dîsa di deqeya 73'yemîn de Makakula gol avêt û Diyarbakirspor li deplasmana Kayseriyê 2-0 destvala vegeriya malê. Bi vê encamê Diyarbakirspor di lîgê de cara 7'ê têk çû. **KAYSERÎ**

# Bamî di warê mîneralan de dewlemend e

Bamî nebatek ji malbata baqilan tê hesibandin. Bi gelemperî ji bo xurekê tê çandin. Gelek cûreyên wê hene, lê di bingehîn de du cûre ne.

Yên kesk û yên reş. Navtenga yên kesk di welatên hênik de 70-90 cm û di welatên germ de jî bejna wê digihije 2 mitroyan.

Rehên wê xwe berdidin kûrahiya axê. Belgên wê dişibin ên mêwan û kesk in. Kulîlka wê spî, nava wê sor, di nava wê soratiyê de navikek spî û di nava navikê de tozdankên wê hene. Dikaka wê dişibe pîramîdek biçûk an jî fîşekên tifingan. Û rengê wê kesk e.

*Welat û Dîrok:* Welatê bamîyên kesk Meksîka û Perû ye. Ji wir ewropiyan anîne welatê xwe û dest bi çandiniya wê kirine. Ewropiyan jî bi xwe re birine welatên ji xwe re kolonîkirî û ji wan deveran jî belavî deverên din bûye. Dîroka wê baş nayê zanîn (yan jî em di lêgerînên xwe de lê rast nehatin). Lê wiisan xuya dike ku ji aliyê xelkên xwecihên Perû û Meksîka ve wek xurek xebitandina wê ne kêmî 1000 salan e.

*Berhevkirin:* Kulîlkên wê dema vedibin, tên berhevkirin, di sîberê de tên hişkkirin û di qawanozan (qetremîzan) de bi devgirtî tên hilanîn. Dikaka wê dema digihê tê berhevkirin, bi benan tê vekirin û li ber sîberê tên hişkkirin an jî tê kelandin. Wek konserve tê hilanîn. Lê xwarina yên taze bi faydetir e.

*Têdahî:* Musîlaj, Hesin, Magnêzyûm, Lîf, Vîtamîn *A, B1, B2, C.*



*Kêrhatî:* Ji ber ku bamî ji aliyê derman ve wek dermanek di rêza duyemîn-sêyemîn de cih digire, di Laboratûwarên Unîversîtan de lêkolînên berbiçav lê nehatine kirin. Lewma em jî li gor destkevtiyên xwe yên di lêgerînan de, wê pêşkêşî we dikin.

**1-** Bandora xwe ji bo tekûz û rêkûpêkirina sîstema giviranđinê heye. **2-** Tekûz xebitîna aşik (mexde) û rûvikan pêk tîne. **3-** Xwînê paqij dike. 4- Îdrarê (mîzê) diqulipîne. 5- Bêneferiyê (bêhaliyê) ji holê radike. 6- Sîngê rehet û nerm dike. 7 – Ji astim û bêhntengiyê re pir bi fayde ye. 8-Qûnêran (kwînêrbîrov) digihîne û der dike. 9- Qebizbûnê (esirînê) ji holê radike.

Der barê bamiyayê de Prof. Ahmet Marankî û Î. Adnan Saracoglû dibêjin: "Bamî ter an jî hişk tên bikaranîn. Lê yên ter (taze) bi faydetir in. Bamî ji aliyê mîneralan ve zehf dewlemend e. Heke kulîlkên wê bên kelandin û ava wê bê vexwarin, wê sîngê nerm û rehet bike."

Bamiya ji bo bêhaliyê yekûyek e. 100 gr bamî hewcedariya bedena mirov a magnêzyûm ji 3/1 û ya hesin jî ji sedî 10an zêdetir pêk tîne. Bamî vê taybetiya xwe ji madeya "Mûsîlaj" madeya wek çilm (kilmîş) distîne.

*Karanîn* : 1- Çaya kulîlkên bamiyê. 2- Xwarin.

*Çayê:* Ji bo her 20 gr kulîlkên bamiyê lîtrek ava kelandî berdin ser bila du kel bênê û 20 deqeyan di dema xwe de bimîne. Rojê 3- 4 qedehên çayê jê vexwin.

*Xwarin:* Ji bamiyê gelek xwarinên goşt û bê goşt tên çêkirin. Ew jî karê kebaniyan e.



*(Ji lêkolîna Bavê Jindar)*



Wêne: Ubeydullah HAKAN

## Li Wanê berfa destpêkê ya salê barî

*Li bajarê Wanê berfa destpêkê ya salê barî. Barfa ku duh êvarê dest pê kir navenda Wanê bi rengê xwe yê spî xemiland. Berfê bi destpêka rojê re cihê xwe ji tirêjên rojê yên germ re hişt.*